

Berbang


82-83

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê



Rojek nû li
Dîroka
Kurdistanê

Gelê Kurd!
Perleman
li We Pîroz
Be







Parlamento ya Nete-
weyî ya Kurdistanê
Rûpel 31



Naverok



Quncika Huqûqi
Rûpel 16



Rojeva mehê
Rûpel 4



komelên Me
Rûpel 12

Beşa Kurmanciya Jorîn

Rojeva Mehê -Vildan Tanrikulu.....	4
Dersên Hilbijartinên - Reşîr Burhan.....	6
Ciwazîxwaz û terorîst Dewleta T.C.ye M. Can Azbay..	7
Dîtin, Raman û Rexne- Malmisaniy.....	8
Dîtin, Raman, Rexne- Şermîn Bozarselan	10
Protestoya Rewşenbîrên Kurd	11
Komelên Me- Komela Jinên Demokrat yên.....	12
Quncika Huqûqi	16
Dîrok, Belge- Zînar	17
Zînar- M. Emin Hawramî	22
Kurd hewceyî cîns û - W.Şoreş Zîrek	26
Çîroka tarîxî Klêopatre- Bîşarê Sekman	27
Agahdariyên Komela Jinên Demokrat	30
Parlamento ya Neteweyî ya Kurdistanê civiya.....	31
Navên Endamên Perlementoya Kurdistan.....	32
Li Başûrê Kurdistan Hukûmet Hat Avakirin.....	35
Nameyên Pîrozbahî yên Federasyonê.....	36

Beşa Zazakî

Di zeri da millet a Kurdan di, şêrê welatî camêr do nêmerd Elişêr	
Koyo Berz.....	37
Çend Helbest ji Faruk Yaqup.....	39

Berbang

Organ för Kurdiska riksförbundet
Organa Federasyona Komelên
Kurdistanê li Swêdê

Ansvarigutgivare / Berpirsiyar
Xebat ARIF

Redaktion
Beroj Akreyî, Bûbê Eser,
Cemal Batun, Dîlan Dersîm,
Hemît Kiliçaslan, Xorto,
Xebat Arif, Mustefa Aydoğan
M. Hînbêşîj

Sättning och Layout

Bûbê Eser, Cemal Batun, Dîlan Dersîm

Adress : Box 490 90, 100 28 Stockholm-Sweden

Telefon 08 / 632 85 85

Telefax 08 / 650 21 20

Postgiro : 64 38 80 - 8

Prenumeration / Abone

Meqam/ Myndigheter 300 Skr

Kes / Enakilda 200 Skr/ kr.

Anons: Insidor / Rûpelên navîn 1500 Skr.

R edaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên bi înzê û gotinên
Federasyonê ye .Nivîsarên ku ji Berbangê re tîrî şandinheke
çap ji nebîrî li xwedî nayên vegerandin.

ISSN - 0281 - 5699 Sal: 11 Hejmar: 5-6/ 92
24. 05. 1992s

Damezrandina Federasyonê : 06. 06. 1981
Çapkirina hejmara yekem a Berbangê : 07/1982

BERPIRSIYARÎYÊN ROJANE



Vildan Tanrikulu

Li başûrê Kurdistanê em dibin şahidên bûyerên dîrokî. Wekî endamê delegasyonê çavdêr yê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê; ji bo hîlbijartina giştî li başûrê Kurdistanê, ez bi xwe di nav vê pêvajoyê û hengavên girîng yên dîrokî de jîyam. Bi encama hîlbijartina giştî ku di 19 Gulanê 1992 yan de çêbû Parlamento Neteweyî ya Kurdistanê di 4 Hezîranê 1992 yan de vebû û ber bi avakirina civateke nû, civateke azad û demokratîk gavên girîng li beşeke welatê me hatin avêtin.

Hîlbijartina giştî di rewşeke fiilî ya şer de hat birêvebirin. Ev beşa welatê me ji aliyek ve hin di bin tehdîda rejîma dîktator ya Baasê û Saddam Huseyîn de ye. Nêzî ji 1/4 ji erdê Kurdistanê Başûr di bin nîrê vê dîktatoriyê de ye. Tehdîdên dewletên din yên kolonyalist, nemaze ji yên Turkiye û Îranê jî li gel vê yekê bidin ber çavan, ev rewşa fiilî ya şer hîn baştir derdikeve holê. Gelê Kurd û serokatiya wê ya siyasî di rewşeke weha de hîlbijartinek giştî bi awayek demokratîk û azad bi cî anî. Ji hêzên Îslamî heta Partiya Komunîst bi heft listeyên cuda beşdarê hîlbijartinan bûn. Tevî gazind û kêmaniyan ku di rewşeke weha de dikare bê holê (Daxuyaniya delegasyona Federasyonê ku di hejmarê 81 an ya Berbangê de hatiye belavkirin) siyaneta encamên hîlbijartîna hat girtin û Parlamento

Neteweyî ya Kurdistanê bi 105 endamên xwe yên hîlbijartî ve di 04.06.1992 yan de li Hewlêrê civîna xwe ya yekem çêkir. Ev yek, di rewşeke weha de, çî jî aliyê siyasî û çî jî aliyê civakî, aborî, kulturî ve serketinek girîng û tecrubeyek biserketî ye ku divê welatparêzên Kurdistanê li her aliyê Kurdistanê bi awayek fireh li ser rawestînin. Neteweyek ku heta nûha jî bo xwe, bi dengên xwe muxtarek jî hîlnebijartiye, tev strukturên wê yên neteweyî hatine hilweşandin, ev girîngî eşkere dibe.

Ji aliyê din beyan û helwestên dewletên dagirker, Turkiye, Îran, Irak û Suriye li hember hîlbijartinan, divê gelek bi diqqet bînin analîz kirin da ku gelsên li pêşîya zelalkirina statuya siyasî ya vê beşa welatê me û li tevahiya Kurdistanê bê fahmkirin. Turkiye hîn jî li "Bakûrê Iraqê" ji valahiya otorîtê behs dike. Îran gaziya jî Turkiye û Suriye yê re jî bo mudaxelekirina bihevêre li hember avakirina dewletek serbixwe ya kurd li herêmê, wekî encamek pêşveçûn û rûdanên li başûrê Kurdistanê dide pêş. Suriye her çend wekî wan dewletên din bi dengê bilind nerazîbûna xwe nayne ziman jî lê ew "bêdengî" bi xwe helwestê wan ya ne dost dîyar dike. Iraq hin di destpêkê de hîlbijartîna û encamên wê ne qanûnî û ne meşrû îlan kiriye.

Ji aliyê din ve jî karûbarên xwe yên raya giştî ji bo ku alîkariyên dewletan, ji bo avakirina Kurdistanê Hukumeta Kurdistanê Başûr û dezgehên wê yên fermî muhattap bigrin, bi awayek berdewamî û firehtir bi rêve bibin. Tenê bi vî awayî ew mîlyon û mîlyarên ku tînin behskirin dikare ji bo avakirina Kurdistanê bi rastî jî bînin bikaranîn.

Li vê derê divê em ji bîr nekin ku her çend îro di warê navneteweyî de jî bo gelê me li başûrê Kurdistanê, piştgirî û alîkariyek fireh heye jî wekî di gelek beyanên jî serokatiya siyasî ya Kurdistanê Başûr de diyar dibe, ev alî-

karî û piştgirî ne di çarçoveyek fireh ya siyasî de ye. Li ser statuya siyasî ya Kurdistanê Başûr, bîr û rayên dewletan bi piraniya jî daxwazên gelê me û yên serokatiya siyasî dîr e. Wan statukoya siyasî ya mewcûd kirine bîngeh. **Bê guman ev yek jî di gelek aliyên de bêaramî û nezelalbûnek jibo pêşeroja vê beşa welatê me derdixe holê.** Di vî warî de dixwazim bi tenê beyana fermî ya wezaretê kar û barê derve ya Dewletên Yekbûyî ya Amerîka (DYA) ku di 15.05.1992 yan de li ser hîlbijartina hatibû belavkirinê bi nav bikim. "Wekî me çend car gotiye, em piştgiriya wê yekê, ku li bakûra Iraqê hebûneke siyasî ya serbixwe derxe holê, nakin".

Ji rewşa rojane ya başûrê Kurdistanê, ji wan sezgehên ku hatine avakirin û tînin avakirin, ji helwestên dewletên dagirker gelek eşkere dîyar e ku li beşeke welatê me wekî encamek ji xebat û têkoşîna bi salan, destkeftîna dîrokî, fîrsetên girîng derketine holê. Parastina van destkeftinan û bikaranîna van fîrsetan ne tenê ji bo gelê me yê li başûrê Kurdistanê, her wisa li tevahiya Kurdistanê wekî berpirsiyariyek girîng li pêş e. **Bê guman li başûrê Kurdistanê gelê me bi xwe û bi sazgehên neteweyî; wekî parlamento û hukumeta ku piştî hîlbijartinan hatiye avakirin di her qada jîyanê de ji bo avakirina civatek nû bi xebat û fedakariya rojane vê berpirsiyariya xwe bi cî tîne. Lê biserketina van hewldanan pêwîstî alîkarî û piştgiriya ye. Kurd li tevahiya dinyayê, li her cîhên ku lê dijîn, dikarin û divê bikaribin bi xwe alîkarî û piştgiriya vê pêvajoya avakirina civat û jîyanê nû bikin û alîkarî û piştgirî ji gel, rêxistin û dewletên dinyayê ji bo vê pêvajoyê peyda bikin.**

Pîrsa herî girîng ku îro di rojevê de ye, rewşa aborî ya başûrê Kurdistanê ye. Li gel vê pîrsa girîng ku jîyana gelê me yekser û rojane dike bin tesîra xwe, pîrsek din jî wekî li jor jî hat behskirin pîrsa statuya siyasî ya Kurdistanê Başûr e.

Îro ji ber statuya siyasî ya Kurdistanê Başûr alîkariyên însanî ku ji aliyê dewletan ve bi rîya Yekitiya Neteweyan (YN) tînin amadekirin, zêdeyî %2-3 nahiye Kurdistanê. Gelek sedemên vê yekê hene. Du sedemên girîng ew in ku piraniya wan alîkariyên ku ji aliyê YN tînin amadekirin, ji bo mesrefên personal û rêxistinî ya YN tînin xerckirin. Sedemek din ya girîng jî newekhevîya bu-

hayê Dolarê yê fermî ya li Iraqê û yê reel(rastî) di bazara Kurdistanê de ye. Bê guman ez naxwazim ku behsa her hewldanên ku rejîma Baasê ji bo pêşlêgirtina alîkariyên însanî li Kurdistanê Başûr dike, li vir bînim ziman. Ev yek baş tê zanîn. Ev rewş ji aliyê nûnerên rêxistinên Kurd yên avakirinê wekî KRA, KRO, KSRO, KARDÖ ûwd. nûnerên rêxistinên siyasî û her wisa ji aliyê serokê hukumetê Dr. Fuad Mehsûm ve bi zelalî hatiye diyarkirin. Ji aliyê din ve jî nûnerên rêxistinên însanî ku bi projeyên xwe yên avakirinê re mijûl dibin jî kêma zêde bi van bîr û rayan re ne. Ev rewşa ku hat behskirin, perspektîfa xebata alîkariya avakirina Kurdistanê zelaltir dike. Alîkarî divê yekser bigihe Kurdistanê û proje li wir bîn amadekirin. Di vî warî de ji aliyê ve em Kurd li derveyî welat dikarin bi rêxistinên demokratîk û însanî re hevkarîyên xwe xurttir bikin, da ku projeyên avakirinê yekser bi destê van rêxistinên li Kurdistanê bîn amadeki-

dezgehên Kurdistanê Başûr ve xwedî çî û roleke girîng e.

Aliyekî din yê pîrsa rojane li pêş gelê me yê li başûrê Kurdistanê jî wekî li jor hat binavkirin, statuya siyasî ye. Wekî tê zanîn di her beyanên ku li ser vê yekê tê kirin, tevahiya dewletên dinyayê, behsa yekîtiya erd (teritorium) ya Iraqê dikin. Biryarên ku di sazgehên navneteweyî de jî hatine girtin wekî biryara 688 ya Komîta Parastinê ya YN, li ser pîrsa gelê kurd wekî pîrsek navxwe ya Iraqê behs dikin. Dewletên dinyayê, taybetî jî her sê dewletên din yên dagirker parastina yekîtiya erda Iraqê û ya rojhilata navîn bi giştî di her fîrsetekê de tînin rojevê. Ev beyan û helwestên ku ji raya giştî re tînin eşkerîkirin rastiya problemên li pêş statuya siyasî ya Kurdistanê Başûr hîn zelaltir dike. Perçûn û wê dîtina ne adil, ne rast bi tenê bi hewldanên gelê me li başûrê Kurdistanê û dezgehên wî yên neteweyî wekî parlamento û hukumetê ve ne mumkun e. Ji bo vê yekê, ji bo

Daxwaza gelê Kurd, îrada gelê Kurd li başûrê Kurdistanê bi hîlbijartinan derketiye holê. Dinya divê guh bide vê daxwaz û îrada gelê Kurd. Û parlamentoya neteweyî û hukumeta Kurdistanê wekî nûnerên gelê me, di vê beşa welatê me de bi her mafên hiqûqî yên navneteweyî ve bê qebûlkirin, bê naskirin.

fên neteweyî û demokratîk yên gelê Kurd, ji perspektîfa "pîrsa navxwe ya dewletê" dernekeve, ev perspektîf berî her tiştî di raya giştî ya dinyayê de neyê rakirin û tesîra xwe li ser polîtîka yên dewletan de nîşan nede problema statu-

tuya siyasî ya Başûrê Kurdistanê çareser nabe. Xebatek jî bo vê yekê divê wekî perspektîfê neteweyî jî bo mafên neteweyî û demokratîk yên rewa yên gelê kurd bê birêvebirin bêyî ku ev xebat xwe bi polîtîkaya resmî ya hukumeta Kurdistanê û hêzên Kurdistanê bi sînor ke. Ji ber ku şikestina perspektîfa raya giştî ya cihanê û dewletan berî her tiştî dê kar û barên hêz û dezgehên neteweyî yên Kurdistanê li her aliyê Kurdistanê hêsantir bike. Daxwaza gelê Kurd, îrada gelê Kurd li başûrê Kurdistanê bi hîlbijartinan derketiye holê.

Dinya divê guh bide vê daxwaz û îrada gelê Kurd. Û parlamentoya neteweyî û hukumeta Kurdistanê wekî nûnerên gelê me, di vê beşa welatê me de bi her mafên hiqûqî yên navneteweyî ve bê qebûlkirin, bê naskirin.

Avakirina her quncîkek welatê me, zelalkirina her awayên statuya siyasî li her cihê welatê me berpirsiyariya her Kurdekî welatperwer e. Ji bo bicihanîna van berpirsiyariyan xebat û fedakariyên hîn zêdetir, girtina siyaneta hevûdu, hevkarîyên di her war û qadên jiyane de, li her derê ku em lê dijîn, pêwîstîyek e.

14.07.1992, Stockholm



rin û em bi xwe bi rêxistinên xwe ve bi wan rêxistinên ku li Kurdistanê bi karên avakirinê re mijûl dibin, pêwendiyên xwe xurttir bikin. Ji aliyê din ve jî karûbarên xwe yên raya giştî jî bo ku alîkariyên dewletan, ji bo avakirina Kurdistanê Hukumeta Kurdistanê Başûr û dezgehên wê yên fermî muhattap bigrin, bi awayek berdewamî û firehtir bi rêve bibin. Tenê bi vî awayî ew milyon û milyarên ku tînin behskirin dikare ji bo avakirina Kurdistanê bi rastî jî bîn bikaranîn. Bê guman di vî warî de peywendî, hevkarîyên xurt çî di navbeyna rêxistinên demokratîk yên Kurdistanê li derveyî welat de û çî jî bi hukumet û

bicihanîna mafên neteweyan ku bi peymanên navneteweyî ve hatine tesbît kirin, wekî "mafê tayîn kirina çarenivîsa xwe ji bo her neteweyek" xebatek pîr alî, berdewamî û fireh divê. Dewletên ku jî bo hiqûqeke adil û navneteweyî behsa bicihanîna peymanên navneteweyî dikin, di rewşa gelê Kurd ya li başûrê Kurdistanê bi taybetî, bi giştî jî ji bo gelê kurd li tevahiya Kurdistanê divê standartekê bikar bînin. Ji bo vê yekê xebata ronîkirina raya giştî, xebata piştgiriya sazgehên neteweyî li başûrê Kurdistanê, hêsankirina kar û barên parlamento û hukumeta Kurdistanê Başûr berpirsiyariyê acil û girîng e. Eşkere ye ku heta pîrsa gelê kurd, ma-

DERSÊN HILBIJARTINÊN BAŞÛRÊ KURDISTAN

Reşîr Burhan

Li başûrê Kurdistanê hilbijartinên ji bo Belediyê, parlamantoya Netewî û Serokayi ya Polîtîk pêk hat. Gelê Kurd cara yekem ji bo diyarkirina îrada xwe çûn ser sendoqan. Bûyera hilbijartinê di dîroka Kurdistanê de rûpelek nû vekir û ji bo Rizgariya Neteweya Kurd pêvajoyek taze destpêkir.

Bê şik, Netewa Kurd di vê pêvajoyê de dikeve rewşek alozi û dînamîkî. Lê belê di pêşerojên wê de jî ewê hin astengiyên ne diyar bi xwera bîne. Gelê me di pêvajoyeke rast deye û pêwîst e vê pêvajoyê bimeşîne. Ez dikarim vê pêvajoyê awa bidim naskirin. Rizgarî, Dezgehên Netewî û jî nûvde ava kirin. Evan her sê xalên pêvajoyê hişk bihev re girê dayî ye.

Hilbijartin, xala bingehîn ya îdarekirina demokratîk e. Bes, ne her hilbijartin. Tenê ew hilbijartin dibe demokratîk, ku îrada gel, ya azad di wir de were diyarkirin. Bes tenê bi hilbijartinek azad îdare ya demokratîk naye damezrandin. Ji bo bikaranîna fonksiyonên demokrasî wek sistemek polîtîk; pêwîst e hemû mekanîzmên wê were damezrandin û were bikaranîn. Heta evan xalana nebin; pêkhatina sistema demokrasî ne mumkune (ne gengaze). Li gor raya min demokrasî, wek sistemek polîtîk ku îdareya wê ne demoratîk be, wê Rizgariya Kurdistanê, dezgehên wê yî netewî û jî nûvde avakirin ewê gelekî zehmet be. Ez dibêjim pêvajoya Rizgariyê; ji ber ku gelê Kurd qedera xwe dixê destê xwe. Ez dibêjim Dezgehên Netewî; ji ber ku gelê Kurd bingeha organên dewletê datîne. Û ez dibêjim jî Nûvde Avakirin; ji ber ku gelê Kurd jî nûvde bajar û gundên xweyî wêran ava dike. Gelê Kurd li başûrê Kurdistanê qedera xwe dixê destê xwe û organên xwe bi metodên (awayên) demokratîk pêk tîne.

Gava zirakbûn û îrada azad ya gelê Kurd bibe yek; tu sedem namîne ku gund û bajarên Kurdistanê neyne avakirin. Û gava Kurdistan dibe berhema gelê Kurd, girîngiya konjukturên navnetewayî û faktorên derve ewqas mezin dibe. Ev dersa yekeme.

Dersa duyem: Ji bo sedemên wek "tecrûba me tuneye," gelê me nezane"

an jî "hêzên derve wê midaxele bike" pêwîst e hilbijartin neyê texîr kirin. Hilbijartina demokratîk ya li başûrê Kurdistanê pêk hat, mîna gelek hêjaye li rojhilata navîn de. Ji ber ku hilbijartinek awa li tu dewletên cîran de pêk nehate. Di dîroka Îran û Tirkîyê de ne mumkun e hilbijartinek weha bête dîtin. Ji xwe ewê gelek komîk be ku em behsa dewletên Ereba bikin.

Ji destpêka xebata hilbijartinê het roja dengdanê, hemû hêzên Kurdistanê (ji îslamiya heta komunîsta) bi hemû rêyên ajîte û propaganda beşdarî hilbijartinê bûn. Li gor raya min piştî hilbijartina li Îsraîl, di rojhilata navîn de hilbijartina herî demokratîk li başûrê Kurdistanê çê bûye. Bes mirov dikare yek rexne li vê hilbijartinê bigre ku ew jî; tu pêwîstiya "Baraj"ê di vê hilbijartinê de tune ba.

Dersa sêyem jî ev e; Di hemû pêvajoya xebata hilbijartinê de li kolonên bajar û gundan de hêzên çekdar digeriyan. Ew hêzên çekdar jî girêdayî rêxistinên Kurd bûn. Lê dîsa jî di navbeyna wan de tu şer çê nebû û xwîn nehate rijandin. Meselên di navbeyna hêzên ji hev cûda, bi awakî demokratîk û bê xwîn rijandin were çareser kirin gavek pir hêja ye û gelê Kurd bi pêkhatina vê metodê tu carî zerarê nabîne.

Metodên halkirinê yên ji dervayî vêya bê fêde ye. Tecrûbeyên me yên di vî warî de vêya baş dide xuyakirin. Divê ev rêya rast bête meşandin. Yanî li hember dujmin em bihev hereket bikin û cûdabûnên xwe bêyî xwînrijandinê halbikin.

Dersa çaran ev e ku me hevçerxbûna xwe îrada me û siyaneta xwe ya ji bo mirovatiyê rê dinyayê da. Ger me li ser vê rêya hanê meşa xwe berdewam bikin, ji bo doza me sempatiya gelên dinyayê dê bêtir bibe.

Dersa pêncem; Tenê bi hilbijartinan, civateke modern nikare bête avakirin. Ger mirov nispeta xwendin û nivîsandinê bilind neke; çanda neteweyî giringtir neke; ji herêmtî û aşitiyê xwe xelas neke, qanûnên hilbijartinê partiyên azadiya fikir komele û sendîkan tunebin; mueseseyên qanûncêkirin, birêvekbirin û dadgehkirinê jî hevneyê veqatandin; çerçewa berpir-

siyarî û selahiyeta wan neyê tespîtkirin, wê çaxê civakek demokratîk nikare bête avakirin.

Meclîsa neteweyî ya ku bi îrada gel hatiye hilbijartin divê bê ku bi derengî keve an qanûnan derxe.

Dersa Şeşem; Organa qanûncêkirinê organa herî bilind e. Tu selahiyetên organa qanûncêkirinê nikare dewrî hinek mueseseyên din bikin. Di pîrsa neteweyî de biryar divê ya meclîsê be. Divê karên Cephê, partî û meclîsê tevlihev nebin. Ger karên van muesesan tevlihev bibin, wê demê mirov nikare behsa îrada gel bike.

Dersa heftan; Di hilbijartinên Başûrê Kurdistan de, mafê di îdare de xwedî peyvbûnê ji bo hemû eqaliyetan hate naskirî. Nuha eqaliyetên li vî perçewelatê me di îdarekirina civakê de xwedî peyv û biryarin.

Ev bûyer di herêma me de, cara yekem li Başûrê Kurdistanê peyda buye. Divê niqte de ji Îsarîlê jî pêşdetir e.

Dersa heştam; Muesesayên hatine hilbijartin divê li ser navê gelê Kurdistanê bi dinyê re têkiliyan deyne. Vêya jî bo dahatiya welatê me ewleyîyeke û ji bo peşveçûna we firsetek e.

Dersa nehem; Perçeyên din yê welatê me divê hem di warê maddî û hem jî di warê manewî piştgirî û alîkariya mueseseyên hilbijartî yê Başûrê Kurdistanê bikin. Li gor baweriya min evan mueseseyan dê bibe dendikên mueseseyan ku di rojên pêşde li tevaya Kurdistanê bête avakirin dê bibe kana serbilindiyê ji bo me û îmkana pesindariya me. Jî aliyê din ve jî ji bo ku pêvajoya rizgariya welêt damezrandina organên dewletê û avakirina civakê neke alîkarê têkoşîna ku li perçeyên din tête meşandin, tu sebeb tuneye.

Dersa dehem; Kurdên ku li dervayî welêt dijîn divê bi giraniyek pir mezin piştgiriya hêzên demokratîk û humanîst wergirin. Ji bo avakirina Başûrê Kurdistanê divê xizmetên teknîk û maddî bête pêşkêşkirin.

Em Kurdên ku li dervayê welêt dijîn divê jî rastî û karakterê pêvajoya ku îro li welatê me tête jiyandin herket bikin û mueseseyên xwe yê neteweyî damezrinin. Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di vî marî de mîna nakeke berbiçav e. Divê em hejmara mînakên weha pirtir bikin.

CÊWAZÎXWAZ Û TERORÎST DEWLETA T.C. YE

M.CAN AZBAY

Şerê ku li dijî gelê me tê meşandin gîhaye dereceyêke bilind. MGK (Komisyona Parastinê ya Millî) bi dîrektîf û dezgehên xwe bi giştî li hember gelê Kurd rakirine. MGK eşkere daye diyarkirin ku pirsgirêka Kurd bi "Zordestiyê" hal bike. Li Tirkiyê tu carî "dadmendî", "demokrasi" (demokrasiya burjûwazî) pêk nehate. Di destûra T.C. de gelekî eşkere tê diyarkirin ku di "îdara welêt" de desthilatdar MGK ye. Hukumet ji komek kesên ku biryarên MGK birêve dibe pêk tê. Kadroyên MGK jî ji nava kadroyên Kontra-Gerilla tên. Wekî din jî leşker tu carî ji îqtidarê dûr nakevin. Bi tenê carna xwe didin paş û li paşiya perdê "bûkikê" xwe dileyîzênin. Li gor şertên AGIK-ê çûyîn û gotinên wek van tev derewin. Danezanînen wiha gelek caran dibin nav ji bo serdestiyên nuh. Ev corê pakêtên bi navê demokratîkbûnê di rastiye de vekirina şerekî lewîtiye ku li dij gelê me tê meşandin. Binav kirin bitenê rûgihartine. Wek rojê tê xuyakirin ku welatê me kirine gola xwînê.

Li gor vê çarçova giştî rewşa me van çendê han zelal bû. Hukumetê biryarên MGK hawaleyî dadgeha destûra bingehîn kir û belgeyên resmî kir qanûn ku girtiyên Kurd neyên berdan. Ev kirinên wan armançên wan yê li

hember gelê Kurd bi me dide zanîn. Biryarên dadgehê ji bo me li hundur û li derve çekê propaganda siyasî bê hempa ye. Divê em vî çekî baş bikar bînin. Ji bo eşkerekirina T.C. kirinên wan yê dûtî, farqa navbera Kurd û Tirk, muanecyeyê cewaz ya hûqûqî dîrokî li hember kurda pêkhatî, di şertên heyî de bêparbûna kurdan ji mafê hûqûqî belgeyên bêhempane. Divê ev ji cihanê re bê gotin û eşkerekirin. Şaşbûn, biguhveavîtin şikestineke cidî ye. Bi sala ye ku ew me bi cewaziyê gunehkar dikin lê di rastiye de ew bixwe ne yên "cêwazixwaz". Ji bilî vê demê Suleyman Demirel bi numûna "Bader-Mainof" diyar dike û dibêje: "em jî, em ê wilo bikin" bûyerek cidî ye. Mana wê ewe ku dibêje ku emê li hundur û derve berê xwe bidin da ku gelê Kurd ji holê rakin. Ji ber vê û li gor me yên hundur divê ev tiştan werin kirin:

1- Berî her tiştî divê ev biryar here Dîwana adaletê ya Ewrûpa. Komisyona mafê mirovan ya Ewrûpa;

2- Rêxistina efûyê ya navnetewî (Emnesty International), Helsinki Wach û jê werin agadarkirin, tesîr li ser T.C. bê çekirin;

3- Li ser cewaziya Tirk-Kurd bingehê zanebûnê birastê bixin û Komîsyona Ewrûpa, rêxistinên ji bo mafên mirovan, rêxistinên dostên kurdan, û parlementerên sempatiya xwe ji bo ge-

lê Kurd hene re aghdarî bikin û wan bikin xwedî zanebûn;

4- Vê biryarê û netîceyên wê yên praktîk bi çapemeniya Ewrûpa bidin nasandin, rûyê sîstema hûqûqê ya tirkiyê heşkere bikin û xalên destûra bingehîn a T.C. yên li ser vê bide xuyakirin, teşhîr kirin;

5- Li Kurdistanê bi kampanyên tebayî cewaziya Tirk û Kurd tê hûnandin û kesên ku li şexsiyeta netewî bi şik meyzedikin divê bêne şiyarkirin;

6- Ji bo şeherezayên Tirk divê propagandayek xurt bête kirin da ku tewrek zelal bidin xuyakirin.

Bi a min divê ev tev bi rêxistinî werin kirin. Ev, bi riya Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê yan jî di bin navê Komîta Girtiyande dikare bê organîzekirin. Lê ku bahweriyên di serokatiyan van karan di vî warî de hemfikirbin...

Dadgeha destûra bigêhîn xala: "Xala taybetî bo girtîgeha terorîstan" qebûl kiriye, di rojên dawî de Suleyman Demirel û Turgut Ozal jî dikin raya giştî amade bikin û li gor vê yekê hingî rêka Eskîşehir vedibe. Vêca Tirkî dibê: "Latin Amrîka". Ewleyiya me bitenê hevalên me, hêzên alîkar û mezinayîya têkoşîna me û hevkarîya wan e. Ji bo vê yekê divê raya giştî ya Cihanê jîndar bê girtin, ev polîtîka divê bête teşhîrkirin û bi vê yekê pêşiya hinek tiştan girtin gelekî pêwîst e.

Ji girtîgeha E.Tipi
ya Bursa/Tirkiyê

DAXUYANÎ

Ew pêşberhema ferhengoka terîmên hiqûqî a bi swêdî û kurdî xebatek kolkêktîf e. Ew ne xebatç min e. Ez bi xwe wek beşdrekî û berpîrsiyarê komîta perwerdaiya Federasyonê di nav xebata vê pêşberhemê de amade bû me.

Mabesta min ew bû ku, di belavkirin û di destxistina vê pêşberhemê de hêsani çê be, ji ber vê yekê min nav û navnîşana xwe di bin pêşgotina vê ferhengokê de nivîsand. Çi mixabin ku ev tişt çewt htiye famkirin. Ji ber vê çewt tégîtinê ez bixwe lêborîna (efû) xwe ji komika xebata vê ferhengokê daxwaz dikim.

Di gel silavên germ.

Şoreş Zirek
14.6.1992

-Me li ser pirsên xwendevanên Berbangê û li ser nameya ku ji terefê Malmîsanîj hatiye şandin ku li jêr diweşinin, ji Mehmed Uzun pirsî: --"-Kek M.Uzun weke ku tu dizanî di hejmara 79-80-ê ya Berbangê de nivîsek li ser semînera Server Tanillî hatibû weşandin. Di wir de agahdariyên ku te dabûn weha bûn. Te gotibû ku «Nazim Hikmet û Kamûran Bedirxan şîrê dayikekê mijandine» Gelo kamûran şîrê diya Nazim mijandîye yan Nazim şîrê diya Kamûran mijandîye? Yan jî jineke din şîrê daye herduyan".

Bersîva Mehmed Uzun weha bû: "-Ez baweri im, bi qasî ku ez dizanim Nazim şîrê diya Kamûran xwariye."

Li ser vê bersîvê dîsa me ji M.Uzun pirsî; herdu nikarin di piçûkayiyên xwe de bi hev re şîrê jinekê bixwin, ji ber ku navbeyna wan de 7 sal ferq heye. Ji bo ronîkirina vê meselê tu dikarî çi bibêjî?

M.Uzun: -Min bi Rewşen Bedirxan re hevpeyvînek kiriye. Ez dikarim careke din li wê mêze bikim. Eger min tiştgekî dît, ezê li we bigerim."

Li gelek mixabin heta nuha Memed Uzun ji mer tiştgekî negotiye.

BERBANG

NAZIM HIKMET Û KAMÛRAN BEDIRXAN

Di 2. 4. 1992'an de Federasyona Komeleyên Kurdistanê Li Swêdê, konferansek organîze kiribû. Yê ku konferans da Profesor Server Tanelli bû. Tanelli, bi kurtî li ser jîyan û xebata edebî ya Ehmed 'Arif (Ahmed Arif) û Cîgerxwîn sekîni û çend şîrên wan xwendin.

Piştî konferansê hin pirs hatin kirin û Server Tanelli bersîvên wan dan. Digel ku babeta konferansê ne Nazim Hikmet (şairê Tirk ê navdar) bû, derheqê wî de jî hin pirs hatin kirin. Gava behsa Nazim Hikmet bû, ji guhdaran Mehmed Uzun hin agahdarî dan û wekî ku di hejmara 79-80. a Berbangê de hatiye nivîsîn, got "Nazim Hikmet û Kamûran Bedirxan ji yek pêsîrê şîrê dimêtin. Têkilîyên Nazim Hikmet bi ronakbîrên Kurd yê wê demê re pîrr baş bûn. Gelek nameyên N. Hikmet li ba Bedirxaniyan hene. Kana van malûmatan jî pîreka Celadet Bedirxan Rewşen Bedirxan e."

Hin tiştên ku Mehmed Uzun gotibûn ji bo min tiştên nû bûn. Loma jî piştî ku ez hatim malê, min li hin kitêban nihêrt û min fêhm kir ku Nazim Hikmet di 1902'an de li bajarê Selanîkê (li Yûnanîstanê), Kamûran Bedirxan jî di 1895'an de li Istenbolê ji diya xwe bûye. Yanî Nazim, heft sal ji Kamûran piçûktir e.

Ez fikirîm, min ji xwe pirs kir "Piştî ku Kamûran heft sal ji Nazim mezintir e çawa her du dikanin ji pêsîrêkê şîrê bixwin? Heft salî û şîr! Ne mumkun e ku her du bi hev re ji pêsîrêkê şîrê bixwin lê dibe ku her duyan di wextên cihê-cihê de (heryekî di dema pitikbûna xwe de) şîrê 'eynî jînê xwaribin? Gelo jina ku şîrê daye her duyan kî ye? Diya Kamûran, yan diya Nazim? Dibe ku ji xeyrî diyên her duyan jineke din şîrê dabe wan. Heke îhtîmala dawîn rast be, jina ku şîrê daye wan kî ye? İhtîmaleke din jî ev e: Gelo ev 'rîwayet' ji binî derew nebe?"

Musa Anter jî di bîranînên xwe de ji devê xweha (xwîşka) Kamûran Bedirxan Mezîyet Alî Bedirxan mesela 'bi hev re şîrxwarin' û 'biratiya' Kamûran Bedirxan û Nazîm Hikmet neql dike. Li gor ku Musa Anter dinivîse, Mezîyet Alî Bedirxan jî alî diya xwe meriva Nazîm Hikmet bûye û têkiliyên malbata wê û malbata Nazîm baş bûne. Mezîyet Alî Bedirxan ji Musa Anter re gotiye, ji ber ku her du di 'emrekî de bûne, di dema pitikbûna wan de diya Kamûran Bedirxan gelek caran şîr daye Nazîm Hikmet, diya Nazîm jî şîr daye Kamûran Bedirxan. Ez bînim bîra xwendevanan ku -dîsa li gor gotina Musa Anter- Mezîyet Alî Bedirxan ji Kamûran piçûktir e (yanê wê bi xwe nedîtiye kê şîr daye kê).

Bi a min, piştî ku Kamûran heft sal ji Nazîm mezintir be, kî dibêje bila bêje ev mesela "bi hev re şîrxwarin" a wan ne mumkun e. Bi vê wesîleyê ez viya jî bêjim: Musa Anterî bi nivîsandina bîranînên xwe karekî gelekî heja kiriye lê di bîranînên wî de hin şaşî jî hene. Wek nimûne, ew dinivîse ku Mustefa Remzî Bucak "di salên 1970 'yî de li Amerîka wefat kir" lê ev şaş e. Min bi xwe di 1985'an de çend caran Mustefa Remzî Bucakê rehmêtî dîtibû. Wî ne li Amerîkayê, li Parisê wefat kir.

Em vegerin ser gotinên Mehmed Uzun. Ew dibêje ku "Têkiliyên Nazîm Hikmet bi ronakbîrên Kurd yê wê demê re pirr baş bûn. Gelek nameyên N. Hikmet li ba Bedirxaniyan hene. Kana van malûmatanan jî pîreka Celadet Bedirxan Rewşen Bedirxan e."

Ronakbîrên Kurd ên "wê demê" yê ku têkiliyên Nazîm Hikmet bi wan re pirr baş bûne, kî ne? Mehmed Uzun behsa kîjan demê dike? Tê zanîn ku Nazîm Hikmet di xortaniya xwe de (hîn gava ku 19 salî bû) ji Tirkîyê derdikeve diçe Moskoyê, çend sal li wir dimîne, dixwîne. Berî çûyina Moskoyê ji xwe hîn xort e, têkiliyên wî bi kîjan ronakbîrê Kurd re hebûne? Berî ku ew vegere Tirkîyê jî hem Badirxanî hem Kurdên we-

latperwerên din ên ku antî-kemalîst bûn bi piranî ji welêt û Tirkîyê derketine. Gelo têkiliyên ku Mehmed Uzun behs dike, wê demê çê bûne, çawa?

"Gelek nameyên Nazîm Hikmet" ên ku Mehmed Uzun qala wan dike, anika li ku ne? Çend heb in? Kê dîtine, kê xwendine? Bedirxanî gelek bûn, nameyên Nazîm li ba kîjan Bedirxanî ne? Haya min bi xwe ji vana jî tune. Tiştê ku ez dizanim ji "gelek nameyên Nazîm Hikmet" -ên ku "li ba Bedirxaniyan hene" - tenê nivîsek di kovara Hêviyê (hejmarê pêşîn) de hatiye weşandin. Kendal Nezan, di Hêviyê de, derheqê vê nivîsê de wanî dinivîse:

"İhtimaleke mezin e ku ev destnivîsar jî di sala 1961 de hatibe nivîsîn û parçeyek ji nama Nazîm Hikmet ji K. Bedirxan re be."

Lê kesê ku wê bixwîne, dê dibîne ku ew ne "name" lê meqaleyek e.

Kendal, gotinên xwe wanî didomîne:

"Mîrê rehmêtî [Kamûran Bedirxan] çend caran ji min re gotibû ku wî Nazîm hê ji Stenbolê nas dikir û malbatên wan nasikên hev bûn, ku heta mirina Nazîm (3. 6. 1963) wan ji hev re name dinivîsîn."

Kendal Nezan qala "biratiya" wan nake. Kamûran Bedirxan ji Kendal re qala nas û "nasik" bûna xwe û Nazîm kiriye lê qala biratî û "mesela şîr" nekiriye. Heke tiştê wanî heye çima qal nekiriye? Ma ji bir kiriye?

Berbang bikaribe van pirsan bigihîne xwendevanên xwe, dibe ku hin kes rabin wek Mehmed Uzun hin agahdariyên din jî bidin. Ma dê baştir nebe?

Mehmed Malmîsanîj

KURSA FÊRKIRINA KURDÎ BI TÎPÊN LATÎNÎ (*)

Di van rojên dawîn de li bajarê Hewlêr kurseke gelekî fireh, ji bo fêrkirina tîpên latînî hatiye amadekirin.


Kursa yekem bi navê Celadet Bedirxan e, ji ber ku ew rêbazî grametîka zaravayê Kurmancî ye.

Kursa duyem bi navê Mamoste Giû Mukrîyanî ye.

Mamosteyê kursê Kek Nûreddîn Botanî ye, her wisa heta niha 200 kesan navên xwe dane nivîsandin. Û ji nav wan 70 kes hatiye hîlbijartin. Ev kurs jî bo berdevamiya vî karî amadeye û heta xwendevan hebin wê ev kurs jî berdevam be. Kek Nûreddîn her weha dibêje ku tîpên latînî, ji tîpên erebî pirtir dengê zimanê kurdî dide. Ji ber ku tîpên erebî dengê kurdî baş dernexe. Ev kursa dibe destpêkek ji bo yekgirtina nivîsa kurdî li seranserê Kurdîstana mezin de. Bi vê xebatê emê nêzikayî li edebiyata Bakur û Rojavaya Kurdîstanê bikin.

Piştî tevagirina kursê her xwendanek wê dîplomayekê bigrin û ew kesên bi serkeftî jî wê bête xelatkirin.

(*) Ev nivîsara ji rojnameye "Xebat" ya organa PKD ne. Hejmar 624/1.7.1992



EM JI BO GUHERANDINA REALÎTA CIVATA KURD

KAR DIKIN

Sermîn Bozarslan

Li ser nivîsa Mahmut Kîper ya bi navê "Di Kongra Federasyonê de Pirsên Jinên Kurd" ku di jimara 79-80-yî Berbangê de de derket.

Heval M.Kîper, li ser pirsên jinên Kurd serê xwe êandiye û nivîsêk lê kiriye. Weke ku ew jî dibêje; ku "Divê li ser vê pirsê minaqeşe û dialog bête kirin".

Heval, di nivîsa xwe de behsa Kongra Federasyonê û pêşniyarên Komela Demokrat a Jinên Kurd radiweste. Dibêje; "Realîta civata Kurd ji bir nekin; pêşniyar û guherandinên ku civata Kurd hîn jê re ne hazirin divê di formulêkirinê de meriv gelek hesas bê".

Berî ku ez pêşniyarên Komela me, yê di Kongra Federasyonê Komelên Kurdistanê de hatin pêkêkirin, bînim zimên, dixwazim dîtînen heval M.Kîper, yê di derheqê "Realîta civata Kurd û xesabûyîna pirsên jinan" bidim ber çavan.

Heval M.Kîper jî dizane ku em ji bo guherandina realîta civata xwe (Kurd) kar dikin. Ger em bi salan rawestî û tîtekî nekin û bi serde jî bibêjin "realîta civata Kurd dest nade", gelo emê bigêhêjin kêderê? Di pêşniyarên me de tiştên hesas tune ne. Em hemû dizanin, ku pirsên di civatan de her gav wek tabû, sergirtî ma nin. Ji ber ku hesas e hertim bincil bûye. Di civata me de kê gava jin doza mafên xwe bikin, bibê nebê jî civatê re berovajî tê.

Wek heval M.Kîper dibêje; "civata Kurdan wek civatên-Rojhelata Navîn, civata mêra (patriarkal) ye". Gelo heval M.Kîper dixwaze vê civata her weha dom bike. Jin doza tu mafî nekin û rûn ta ku ev civat jî ber xwe ve bibe civata "civata patriarkal" dixwaze vê civata xwe bidomîne; jin tu heq îdîa nekin û rûnêkin ku ta ev civata, jî ber xwe ve bibe civata jin û mêran, civata wekhevî û azad. Divê em "çi jin, çi mêr" yê ku mafên me bi hev du re di civata demokratîk, aza û wekhevî de mimkûn e, jî xwe re bikin armanc ku civateke weha saz bibe. Ji bo sazkirina civateke weha, jî nuha ve divê em dest bi vî karî bikin, sibê dereng e. Jin ne mecbûr in ku tesîrên civatê ku hene, jî ser xwe nikaribûne bavêjin an jî naxwazin bavêjin û loma pirsê jinan jî wan re xesas têt, hêvîyên wan bisekinin da ku ew xwe biguherînin. Kurdên ku hatine Swêdê,

piraniya wan siyasî ne û di civata Kurd de yê herî pêşketî ne, jî bo wan ew du pêşniyarên herî normal xesas nî ne. Ger jî bo wan jî xesas be, em çi xwelî li serê xwe kin...!

Di kongran de biryar bi usûlên dengên piranî têt girtin û her biryar îrade kongrê nişan dide. Bi dîtina min piraniya nûnerên Kongra Federasyonê Komelên Kurdistanê jî bo pêşniyarên Komela Demokrat a Jinên Kurd, xwestinekî pozîtîf nişan dan û yek pêşniyarê me qebûl kirin, ku li ser kontenjanê bû. Ev gavekî baş e û pêşve ye. Di hemû sistemên welatên pêştaçuyî de (wek Ewropa) jî bo jinan kontejan heye, jî ber ku di wan civatan da "jin û mêr" hin ne wekhev in.

Me xwest ku, pêşniyarên xwe digel hevalên Federasyonê hazir bikin. Ji ber vê yekê me serokotiya Federasyonê Komelên Kurdistanê, di meha yanzdan a 1991-ê de dewatî civîna xwe kir û jê re dîtînen xwe gotin. Ji ber vê yekê me di 1991.12.15-an de bi navê "Ji bo Jinên Kurd, organîzasyonêk çawa hewce ye" konferansê amade kir û gaziye hevlên komîta karger ya Federasyonê Komelên Kurdistanê kir. Me gaziye komelên endamên Federasyonê jî kir. Lê mixabin jî wan yek jî nehatin. Di vê konferansê de, em li ser pirsê "Yekitiya Jinên Kurd" sekînin û hin biryaran jî bo pêşniyarên girtin. Me di kongra xwe ya 1991.12.21-an de jî komîsyonek jî bo vî karî pêkanî. Me wan pêşniyarên xwe bi nameyek ve jî Komîta Karger a Federasyonê re şand û li ser tîbînyek jî danî ku vê namê teslîmî "Komîta Rawêj û Komîta Giştî" jî bikin. Me ev namê şand Berbangê jî. Me dîtînen jî pêşniyarên xwe li ser "Yekitiya Jinên Kurd" di vê nameyê de rêz kir û jî wan daxwazê zûtîrîn bersivdanê xwest. Me dîyar kir ku heta kongrê Federasyonê, em bi hev û du van pêşniyarên xwe zelaltir û hêsantir bikin. Lê mixabin jî nameya xwe re jî me bersivêk negirt. Gelo dialogê bi yek alî dibe?

Beşêk jî nameyê me weha bû: "Di civata me de dest û lingên jinan girêdane. Lê gotine; fermo her tişt jî bo we vekirî ye. Bixwînin, zana bibin, polîtîka bikin, ma em ne wekhev in, hûn jî divê wek mêran bibin... Lê ne bi şertê mêran, bi şertê jinan".

Em nikarin ên ku ne wekhev in û ne xwedî mafên wekhev in, di destûr û intizamên xwe de wekhev bigirin ber çavan û bi vî awayî, ên ku ne wekhev in

têxin eynê pêşbirikê. Heta ku jin û mêr ne wekhev in, jî bo wan destûr û intizamên cûda hewce ye. (Ji bo temsilkirina jinan û pêşteçuyîna wan). Ji ber vê yekê ew nayê wê manayê ku jin mafên cûda dixwazin. Em divê jî bo temsîla jinan di "Federasyon" û "Komelên endam" de baştir bibe, tedbirên taybetî bigirin.

...Em ghiştin van nitîceyan:

-Komela me potansiyela nûha bela nake, wek xwe dimîne, lê fonksiyon û navê wê têt guhertinê, dibe "YEKITIYA JINÊN KURD".

-Endamên komelê (Yekitiya Jinên Kurd) dê karibên di komela belediya xwe de jî endam bibin. Lê dikarin jî cîhek nûner bîn hilbijarîne...

-Komelên belediyan seksiyonên jinan ava dikin û listên wan dişînin "Yekitiya Jinên Kurd".

-Divê jî bo hemû organên Federasyonê Komelên Kurdistanê û ya komelên belediyan "Kontejnana Jinan" hebe.

-Em jî bo pêşniyar û daxwazên din jî vekirîne û daxwaz dikin ku di demeke kurt de jî we bersiv bigirin."

Me tu car pêşniyar nekiriye da ku komela me, jî xên "Yekitiya Jinên Kurd" jî hebe, Me gotiye ku, em nav û fonksiyon diguherînin û dibin "Yekitiya Jinên Kurd" û jî bo we çi hewce ye dikin.

Dibe ku jî kurtbûna wextê di kongrê de em nikaribûn pêşniyarên xwe bidin fehmkirinê. Lê heval M.Kîper bixwe di Komîta Karger ya Federasyonê de bû, dikaribû pêşniyarên me bixwenda û bi me re tîkilî dayne. "Komelên endam" bixwe bi wesîta nûnerên xwe destûra "Federasyonê" çêdikin û biryaran digrin. Di destûra "Federasyonê" de tenzîma kongra "komelên endam" heye. Gelo çima li ser vî tenzîmê, biryarekî di kongra "Federasyonê" de bê girtin dibe ne demokratîk?

Me tiştên bê pîrensîbî çênekiriye. Lê dibe ku prensîbên me û yîn heval M.Kîper hev du negire, ev tiştêkî din e.

Nûha tîkiliyên me bi orgnên Federasyonê re jî berê xurtir e. Ev tiştêkî pozîtîf e û divê bête domandin. Divê bi raya dialog û hevdu guhdarîkirinê em bigihîjin netîcayên baş. Ez daxwaz dikin ku heta kongra sala pêşbê, em li ser avkirina "Yekitiya Jinên Kurd" û forma wan pêşniyarên xwe bi hevdu re zelaltir bikin û heziriyeke baştir bikin.

PROTESTOYA REWŞENBÎRÊN KURD

Seroktiya Şewra rewşenbîrên Kurd yê Ermenîstanê têlêgramek ser navê serkarên têlêvîzyona Rûsiyê Yêgor Yakovlêvre şand, nava kijanêda hêrs û protêstoya xwe bona wê yekê elam kir, ku bernama têlêvîzyona "Vesti" 24-ê adarê sala 1992-a serhildana kurdaye mîletîyê-azadariyêye li Turkiyê nav kir wek sêparatîzm.

Em zendergirtî dimînin, -têlêgramêda tê gotinê, -ku dewsa wê yekê, wekî piştgirîya şerkariya kurdaye azadariyêye heq bigrin, di bernama weda sîyaseta Turkiyê resmî tê binperdekirinê, ya ku sîyaseta gelkujîyê (jenosîd) hindava gelê kurd pêk tîne. Bernama "Vest" ne tenê xirabkêrî dîhar kir û înfomasî opêratîv bi feşkirin raber kir, lê usa jî da kîvê, ku ew fikra gotina "sêparatîzm" rind tê negihîştîye.

Serokatîya Şewra Rewşenbîrên Kurd Li Ermenîstanê

CIVÎNA RÊXISTINA REWŞENBÎRÊN KURDÊN ERMENÎSTANÊ YÊN YEKEMÎN

Warguhasî tinên mezin, ku him li hemû Yekîtiya Sovîete berê, herwaha li Komara Ermenîstanê da dibin, bûne sebeb, ku rêxistineke kurdên Ermenîstanêye nûner bê sazîkirinê, ya ku wê bi xem û daxwazên gelê xweva giro be, jêra bibe pişt û alîkar.

Bona vê armançê van roja di rêdaksiyona rojnama "Rya Teze"- da civîna rêxistina rewşenbîrên kurdên Ermenîstanêye yekemîn hate derbazîkirin. Civîna berpirsyarê rojnamê Emerîkê Serdar vekir. Ewî nava peyvandina xweda sazîkirina rêxistinê silav kir, giringîya pêwîstiya wê da kevşê seba safîkirina problemên olka kurdên Ermenîstanêye netewî-çandî. Armanceke rêxistinê jî ew e, ku serokatîya komarê înfomasona rast bistîne derheqa meda. Ango, rêxistinê gerekê bibe nûnerê kurdên Ermenîstanê.

Dûra serokê civînê, helbestvan Karlênê Çaçanî hîvî ji tevgerên civînê kir, ku şîbiya, bi kerrbûna (bêdengbûna) deqekêva qedrê biranîna şahîdên têkoşîna li Kurdistana Îraqê û Kurdistana Turkiyêye netewî-azadariyê, şahîden şerê li Çerebaxa Çiya bigrin.

Paşê ev kes peyivîn: Akademîkê Akademîa Ermenîstanîye "Ezanyarî,

Şekroyo Xudo Miyoyî, Profêsor Şerefê Eşîr, doktor Çerkezê Reş, Xalit Çetoyêv, Eskerê Boyîk, Tosinê Reşîd, nivîskar Wezîrê Eşo, helbestavan Fêrikê Ûsiv, Egîtê Şemsî, dengbêja heja Aslîka Qadir, dersdar (mamosta) şîraliyê Ahmed, serokê şewra gundê kurdaye Şamîramê Sûtoyê Feyzo, wergervan Hesênê Ûso, wênekêş Cemalê Jora, Pale Mirazê Cemal û yên mayîn.

Em peyvandina wana dicivînine ser hev û li jêr raberî guhdariya we dikin:

-Ew pê! Bîyayîye zor, ku welêda li her dera belav bûye, hatiye gihîştîye me jî. Şertên jîyanê em mecbûr kirine rêxistinekê çê bikin. Şansê me başe, ku em komareke usada dijîn, li ku hindava gelên biçûkda xemxurî û guhdariya herdemî hebiye û li kîderê mafên kurda bi dewletî hatiye naskirinê û ew bûye tradîsîona baş. Alema jî em gerekê bi karîkirina xweva bi her awahî piştgirîya komara Ermenîstanê bikin, ku xwe rîya serbestiyê girtîye. Bi wê yekêva emê şekirdariya xwe elamî wê xemxurîyê û guhdariyê binin.

Îro em dixwezin bona parastina nîgara xweye netewî, hildana dutîretîya nava weke 60 hezar binecîyên gelê meye vira, ku bûye "kula piçengê" û destmala ser destê" kelegoz û fêlbeza, û pîrsên mayînda li we bişewirin.

Em gerekê hiç tiştî ji gel veneşêrin, herdem herne gundên kurda, rastî gel bîn û pêra bipeyivîn. Bi vê baweriyê, rêxistina me gerekê bona gel û ya gel be.

Em gerekê usa bikin, ku gelê Ermenîya me rind nas bike, dema safîkirina filan an jî bêvan pîrsa gelê me, li me bişewire, birûbaweriyên me hilda ser hesab, rast serederiyê li wan "lîdêrên mîlete" xweserîwe bika, ku aktîvîya wanaye ji çapê der zîyan û zirarê nede dostaiya herdu gelên me. Em gerekê ji bîr nekin, ku dijminê gelê Ermenîya û kurda, yeka, û lema jî em gerekê bi maştabên diha fireva hevdu ra kar bidin.

Em bona sazîkirina rêxistina ahaye gelekî giring û bi navûdeng hinekî derengî jî ketine. Pêwîstiya wêya zûda cihata texmînkirinê. Dema di navbera daxwaza sazîkirina vêrêxistinê û pêkânîna wêda, wek dibêjin, ya xwe kir. Û eger damezirandina "Yekîtiya Êzdiyan", weşandina rojnama "Dengê Êzdiyan" dikirin bi aktîvîya çend şêxa û mirovên ji wan dereca dûr şirovekin, lê

ji vekirina radîa "Bona Êzdiyan" kêmekê bineke xweş neyê. Temamîya gelê kurdaye 30 mîlionê, herwaha weke mîlionek kurdên Êzdiyê li cihanê dijî van yekane.

Bira nava amadekarên civînêda ew fikra şaş-xelet çê nebe, ku îdî çend merivên nezanra li hev hatiye "bibîne xwe-diyê gel" û serkarîkirina mîlet hildine destê xwe. Em tanê nimûna gundê Şamîramê binin, ku gundê kurdayê harî mezine komarêda: Bawerbîkî tamamîya binecîyên gund pey wan "serokên" mîlete nuhçêbûyî naçe, yên ku dema xweda wek xudêgiravî li dêrên mîlete dîndariyê-olî gel xapandine-talan kirine, lêniha jî bi "psikologîa daçêbûyê" dixwezin gelê dilsaxe sade bixalîfîn û "ava şêlûbûyîda masîya bigrin". Em çawa bikin, em bûne şêdê pêrêstroytka vî awahî jî.

Paşê civîn derbazî enanekirina pîrsa duda bû. Ev mirov nava serokatîya sêrixistinêda hatne hilbijartinê:

1. Şekroyê Xudo Mihoyî (serok),
2. Şerefê Eşîr (cîgir).
3. Çerkezê Reş (cîgir).
4. Têmûrê Xelîl (Sekreter)
5. Emerîkê Serdar.
6. Karlênê Çaçanî.
7. Tosinê Reşîd.
8. Eskerê Boyîk,
9. Babayê Keleş.
10. Kinyazê Hemîd.
11. Aslîka Qadir.

Ew kes jî hatne bijartinê wek nûnerên serwêrtîyêye ji gundên kurda û yên kurd lê dimînin:

1. Sûtoyê Feyzo (Ji gundê Şmaîramê).
 2. Zurbê Emir (Ji Armavîrê).
 3. Têmûrê Mîro (Ji Êcmîazînê)
 4. Paşayê Efo (Ji Talînê).
 5. Rêzoyê Ûsib (Ji Aragasê).
- Nevoyê Gozel hate bijartinê wek nûnerê xwendekarên kurd yê Ermenîstanê.

Fonda rêxistîê jî hate sazîkirinê.

Civînê biryar kir qanûnname rêxistinê amade bike û raberî wezîreta Ermenîstanêye Yûstîsiyê bike bona komela nuhsazbûyî bi zagîne bê testîqîrinê.

Civîna duda ya rêxistina Roşnîbîrên kurdên Ermenîstanê wê van dmên nêzikda bicive. Ewê bibe kongrêa Rêxistinê.

Bira Pîroz bibe.

Jin bingehê jiyanêye

Cemal Batun
Bûbê Eser

KOMELA JINÊN DE MOKRAT ÊN KURDISTANÊ LI SWÊD di Ilona 1985 ' an de hatiye damezrandin. Bi qasî 20 - jinên kurd berî Kongreya damezrandinê wekî endamên damezger, komîteyek di nav xwe de hîlbijartîye û vê Komîtê programa Komelê jî pêşkeşî Kongreyê kiriye. Di Kongreya yekem de nêzî 60 - 70 jinên kurd beşdarî kirin e. Di avakirina Komelê de Federasyonê alîkariyek xurt nîşan daye. Gava Komele hatiye danîn, tenê jinên kurd ji başur û bakûrê Kurdistanê hebûn e, îro ji her çar perçên Kurdistanê, endamên Komela Jinên Demokrat ên Kurdistanê li Swêdê hene. Li gor agahdariya heyî ew yekem Komela jinên Kurd li Ewropa bûye.



Piştî me biryara vekirina çend quncikan di Berbangê de girt û di hejmara 81 ' an de nivisandin, ji gelek xwendevan û Komelên me pîrozbahî gihîştin me. Em spasiya hemû hevalan dikin. Piştgiri ya kovara Berbangê şehwa xebatê zêdetir dike. Di vê hejmarê de jî, di quncika "Komelên me" de, me Komela Demokrat a Jinên Kurdistanê li Swêdê hîlbijart. Li ser navê wan di hevpeyvînê de Seroka Komelê Şermîn û herweha Gulperî û Şadîme amade bûn.

Berbang : Nuha li ser avakirina Komela we, em xwedî agahdariyan in, gelo di dema avakirîna de we çî armanc dabûn pêşya xwe ?

Gulperî : Komela me, armancek ji bo cihê jina kurd di civaka me de û rola wê ya bingehîn bîrê ber çavan, ya ku ji alî me ve tiştê herî girîng, danî pêş xwe. Ez bawerim di vê babetê de, di pevajokek 7 - salan de me gelek karên heja kirin.

Herweha wekî jinên welatêkî bindest me gelek armancên din ên komelayetî jî danîbûn pêşya xwe. Wekî nasîna jiyana jina kurd, ji bo raya giştî ya

Berbang : Di pêvajoya xebata we de, çî asteng li pêşya we derketin ?

Şadîme : Karê mala kurd hema hema bi tevayî li ser piştî jina kurd e. Insiyatifa biryarê di malê de jî di destê mîrê kurd de ye. Em bibêjin, jina kurd û mîrê kurd di rojekê de civînên wan hene. Yê diçê civîna xwe, her dem dibe mîrê kurd.

Şermîn : Bê gûman jin û mîrê kurd, statukoya malê ji Kurdistanê bi xwe re aniye Swêdê. her çend guhertinên biçûk di malê de pêk hatibin jî, bi tevayî tişt wekî berê ne. Rewşa aborî jî babetê herî girîng e. Gava aborî di destê

mêr de ye, her tişt xwe dibîn e. Ev tişt dibin asteng li pêş karên me yên civakî û komelayetî jî.

Berbang : Baş e, nuha tişteki din ji heye. Di salên dawî de di aboriya mal de jin jî biqasî mêr xwedî peyv e. Bi taybetî li Swêdê nimuneyên weha jî hene, ku aboriya malê ji alî jinê ve tê avakirin. Li gor bersîva te, ev statukoya ku te behs kir, a li ser aboriyê tê danîn, xera nabe ?

Şermîn : Na ! Hingê barê jinê girantir dibe. Li zarokan dimeyzenê, karên malê dike û aboriya malê jî li ser destên wê ye. Mêrê kurd, bi tevayî di van xalên herî girîng ên jiyana de, pasîf dimîn e û beşdar nabe. Ez dixwazim bibêjim, di jiyana rojane de, mêrê kurd di malê de nîn e.

Berbang : Bi avakirina Komela Jî - nan, we bi çi awayî alîkariya jina kurd di civaka me de kir ?

Gulperî : Bi kêmanî ji her çar aliyên Kurdistanê, me jinên Kurd bi hevdu dan naskirin.

Li ser rewşa Kurdistanê û Ewropayê me gelek semîner dan.

Baweriyek me da jina kurd, ku dikare sazûmanekê birêve bibe.

Di nav 7 salan de me sê şev pêkanîn ên ku gelek serkeftî bûn. Tevayiya programê bi destên me hate danîn. Ji afîşe bigrin heta koroya di şevê de, jina kurd bicîh anî.

Me konferansên fereh lidar xist.

Mêrê kurd bi xwe nuha li karên em dikin, pozîtîfîr meze dike.

Wekî nimuncê, di kongreya Federasyonê ya XII ' an de biqasî 15 - 20 jinên kurd mîna delegeyê kongreyê beşdarî kirin. Di kongreya Federasyonê ya Tirkî de jî, ya ku civaka wan li Swêd çend caran ji ya me kurdan zêdetir, tenê 3 jin beşdarî kirin e. Îca ferqiyet diyar dibe.

Berbang : Gelo hûn pêşeroja zarokên me çawa dibînin. Hûnê bixwazin çawa alîkariya wan bikin, ku ew ji civaka xwe dûr nekevin ?

Gulperî : Di mal de divê mirov bala xwe bide zarokan. Tesîra dê û bav li ser zarokên Kurd, ku xwediyê civaka xwe derkevin, tiştê herî girîng e. Ku zilam an jina kurd, bi zarokên xwe re bi zimanê swêdî qîsa bikin û wan rêbikin dagîsên swêdî, bê gûman dê berhemên şaş bide. Dûrketin ji kultur û civaka xwe, ne tenê ji bo civaka me jî bo her civakê xeterê mezine.

Dibistana yekem û ya herî girîng mal e. Zarok jî hatine netewekî ye. Mirov divê gelek gelek bala xwe bide vî tiştî.

Şermîn : Tebîî ye rewşa jina kurd di civakê de, li ser tesîrbûnê ya zarokan zêdetir e. Hevala zarokê di civaka me de dayika wî ye. Jiyana zarokê bav ji dê fêr dibê. Gava li terbiyê û rewşa zarokê di civaka me de tê meyndin, yekem dê tê bîra mirov. Bi peyvên din di 24 saetê rojê de ji 4 / 3 zarok bi

dayika xwe re di têkiliyê de ye. Bê gûman divê mêrê kurd di vê prosesê de li cîhê xwe yê girîng xwedî derkeve.

Di çand û kultura kurd de bê şik tiştên gelek pozîtîf hene - wekî rêz - girtin ji bo mezinan re. Lê, yên negatîf jî hene - wekî lêdana jinan û tirsê, nerêkirina keçan bo dibistanan û hwd. Divê li Ewropayê mirov van tiştên negatîf jî, di terbiyekirina zarokan de bikar neynê. Mirov divê rê nedê dijberiyên hişk di navbera zarokê û xwe de. Divê mirov li rêya diyalogê bi zarokê kurd re jî bigere. Zarokên me li Ewropayê di nav du kulturên de mezin dibe. Civaka Ewropa bê gûman tesîra xwe li zarokên me dike. Bi qedexekirinê ez bawer dikim di pêşerojê de, rê ji bo reaksiyonên xurt veke. Bi qedexekirin, lêdan û tirsê em rêya rast nikarin nîşanê zarokên xwe bikin. Rêya danûstendinê di malbatê de divê her dem vekirî be.

Berbang : Gelo hûn çi ferqê di navbera jina swêdî û kurd de dibînin, hûnê bikaribin çawa vê ji xwendevanên me re vekin ?

Gulperî : Jina swêdî û kurd newekhevin. Em xwedî du kultur, dirok, pêwendiyên civakî, zanabên û hwd. in. Em ji civakek feodal tîn û jinên swêdî ji civakek endustriyal tîn. Tebîî imkanên di destê jina swêdî de heye, di destê jina kurd de hebe, em ê ji wan gelekî pêşketîr bin.

Şermîn : Problema jina swêdî ya



rizgarkirina welatekî nîn e, lê gava jina swêdî qisa dike, dibêje ku rêya pêşketina Swêdê wê daniye. Wek em dizanin, berî 50 - 70 salan gelek mafên di destê jina swêdî de hene, tunebûn e. Jina swêdî di civaka xwe de bi rastî jî cîhê xwe girtiye. Mafê sigortayê ya dayikan wekî nimune mafek gelek girîng di destê jina swêdî de ye. Jina swêdî îro dixwaze, ku roja kar bê kêmkirinê 6 saetan, da dê û bav demek wan ê dirêjtir bi zarokên wan re hebe. Jinên swêdî dibêjin, em û mêran wekî hev kardikin, lê ew ji me zêdetir maaş digrin. Jina swêdî di - bêje jiyana sosyal di destê me de ye, lê karîer di destên mê - ran de ye. Ji îro û pê ve jî ev pirs divê bi - keve rojeva Parla - mentoya Swêdê de. Wekî li her derê jin bingeha jiyane xwe dibîne.

Pirsa jina kurd îro ne ev pirsên jorin. Struktur a jiyana ci - vaka me ji van tiştên jorin cudatir e. Jina swêdî di jiyana mal - bata xwe de şert di deyne, ji vî mafî em bêpar in. Ferqiyet he - mû ji vir derdikevin. Wekî jina kurd me xwe kiriye qurbanê jiyana civakî ya gelê xwe, ya zarokên xwe, ya mêrê xwe, ya dê û bavê xwe, ya eşîreta xwe, ya welatê xwe...

Berbang : Wekî jina kurd çi daxwa - zên we ji mêrê kurd heye. An bi pey - veke din hûn dixwazin çi mesajê bidin mêrê kurd ?

Şermîn : Mêr û jina kurd divê şore - şê di pêwendiyên xwe yê civakî de pêkbênin. Divê em bibînin, ku jin û mêrê kurd di civaka me de ne wekhev in. Piştî me ev tişt qebulkir, ji bo vê şoreşê bingeh tê danîn. Hemû tiştên din girêday ve yekê ne. Ger jin ji rewşa xwe ya bindestiyê nerehetiyê nîşan bike, tê mana ku rewş ne wekî tê xwestinê ye. Divê mêrê kurd ji bo

jiyanek demokratîk amade be û bizani - be ku ew nikare tevgera jinan birêve bibe. Jin divê bi destê xwe pirsên xwe bînin rojevê. Jin bixwe divê zorê bide guherandina mêjiyên paşketî û hişk. Em dibêjin bê jinan şoreşa rizgarkirina welatê me pêk nayê, lê em vê îmkanê jî nadin jinê. Ew di mala xwe de wekî mêrê xwe azad û wekhev be, hingê dikare di şoreşê de cîhê xwe yê girîng bigre.

Gulperî : Jin û mêr divê ne bi çavên dijminatî li hev meyzînin. Pêwendî -

Di protestoyên hemberê Iraqê de bi awayekî ferah em beşdar bûn. Lê, tu projeyên me yê avakirina gund li welatê me nîne. Bi vî awayî jî, çi ji destên me bê em piştgirîya van projan dikin, barê bikeve ser milê me, em ê bicîh bînin. Li gel vê, em karên din ên pêwîst dikin. Wekî - roja vekirî. Wê rojê telefonên me û komela me ji bo jinên kurd ên nu hatine Swêdê û yê problemên wan hene dixebitin. Îro bixwe (21. 06.1922) jinek kurd ji başûrê Kurdistanê telefonê me kir, ku mêrê



yên me divê wekî beşên wekhev yê civakê bin.

Berbang : Di hejmara berê ya Berbangê de Komela Eskîlstuna diyarkir ku projeyek wan a avakirina gundekî li Başûrê Kurdistanê heye. Vê yekê xwendevanên me gelek dilşa kir. Bi vî awayî çalakiyên Komelên me di rûpe - lên Berbangê de dighin civaka me li Swêdê. Gelo çi projeyên we hene ?

Şermîn : Ji bo alîkariya Başûrê Kurdistanê wekî Komela me jî gelek çalakiyên girîng lidar xistin. Endamên me di komkirina peran de aktîf xebitîn

wê wefat kiriye û çar zarokên wê hene û bêkes e, ji bo pêwendiyê bi me re têkilî danî. Herweha me daye pêşya xwe, da em jinê kurd ziyeret bikin. Ji bo avakirina Yekîtiya Jinên Kurd em xebatek berferah dikin. Gava yekîtiya me pêk hat nûnerên me, em daxwaz dikin li gor biryarên Kongreya me, di Kongreya Federasyona Komelên Kurdistanê de beşdar bibin. Em dixwazin yekîtiya me bibe nimuneyek di pêşerojê de, di Kurdistan azad de.

Berbang : Gelo hûn daxwaz, pêşni -

Komîteya Karger a Federasyonê re di-karin diyar bikin ?

Sermîn : Isal pêwendiyên me bi hevalên Komîteya Karger a Federasyonê Komelên Kurdistanê li Swêd re, ji yên berê gelekî baştir e. Hevalên Komîteya Karger bi rastî daxwaza wan a têgihîştina probleman heye. Em pîrozbahî û spasiya wan dikin.

Li ser rexneyên me, di vê babetê de jî em dixwazin tiştekî bêjin. Gava Delegasyonê Federasyonê ji bo hilbijartinên Başûrê Kurdistanê çû wir, divabû agahdariya me jî bi awakî fereh hebane me dixwest jinek kurd jî di vê delegasyonê de cih girûban e.

Berbang : Baş e, çima heta nuha tu jinê di Komîteya Karger a Federasyonê de cih negirtiye, hûn vê yekê çawa îzah dikin ?

Şadîme : Çend caran pêşniyarên weha ji me re hatin. Lê, birêvebirina her du karan - karên Komela Jinên Demokrat ên Kurdistanê li Swêdê û yê Federasyonê bi hev re ji me re karekî gelek zehmet e. Em ne daxwaza endamiyê di Komîteya Karger de dikin, em dixwazin hevalên di wir de cih digrin, problemên civaka me bidin ber çavan û li alternatîfa çareserkirina van probleman re, rê diyar bikin û vekin.

Berbang : Wekî Berbang me çend quncikên nu di kovara xwe de vekirin. We di hejmara berê de hin ji van guhertinan dît. Raya we li ser van guhertinan çi ye ? Ji ber ku Berbang kovara hemû Komelên Federasyonê ye, em dixwazin helwêsta we li ser vê pîrsê bigrin ber çav.

Sermîn : Em pîrozbahîya redaksiyona Berbangê dikin, ku ev kar daye pêş xwe, da Komele xwe di kovarê de bibinin. Herweha ev helwêsta hevalên Federasyonê ya nu jî diyar dike. Di karên we de em serfiraziya we dixwazin.

Şadîme : Berbang bi van guhertinan ji min re xweştir hat. Ev karek pîroze ku hûn dikin, gelek spas.

Gulperî : Hevalan dîtînen me hemûyan gotin. Ji bo vê hevpeyvînê li ser navê Komela Jinên Demokrat ên Kurdistanê li Swêdê, em carek din spasiya we dikin.

Berbang : Spas !



Birayen delal hûn werin xortino
Buhusta welat de em herin merdino
Eger hûn neyên wane keç em meşin
Bese koletî serfiraz em bijîn

ÇALAKIYÊN GIŞTÎ YÊN KOMELA JINÊN DEMOK- RAT ÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

* Kursa zimên - jinên
Swêdî jî tê de beşdar dibin.
(hejmara beşdaran - 20)

* Kursa sazê

* Kursa folklorê ji bo za-
rokan

* Kursa folklorê ji bo
jinan

* Rojên yekşembê -
odeya vekirî, ji bo problem
û daxwazên endamê
Komelê û herweha yên
jinên Kurd, ku alîkarî ji
wan re divê.

* Kursên tiyatro (heta
nuha du ji wan hatine ley-
istin - "Ez nizamim mêrê
min zanê " û "Kowîşa
jinan ")

* Bi "Kvinnor för fred "
re li dij rasîzmê platformek
hatiye pêk anîn. Panelek jî
bi navê - Jinên Rojhilata
Navîn hatiye lidar xistin.
Tê de jinên ji Iraqê, Iran,
Tirkîyê, Îsrail û Filistinîy-
an beşdarî kirin.

* Ji bo jinên swêdî
kursa fêrkirina kurmancî
hatiye vekirin.

* Ji bo jinên swêdî
kursa fêrkirina govendên
kurdî hatiye vekirin.



Huqûqzan bersiv dide

Weke hûn dîzanin ku ji hejmara Berbangê ya 78-an pê ve, em bi alîkariya awûkata hêja Elisabeth Fritz, di warê hiqûqî de ji xizmeteke nû pêşkêşî we dikin û bi navê "Huqûqzan bersiv dide" quncikeke nû di nav rûpelên Berbangê de hatiye vekirin.

Tu nuha dikarî pirsên huqûqî ji awûkata Berbangê Elisabeth Fritz bipîrsî. Awûkat Elisabeth Fritz di buroya awûqatiyê ya bi navê "Sahlström Juridiska Byrå AB" de dixebite û li gel Swêdî bi zimanê Suryanî jî dizane.

Di her hejmarên Berbangê de, Elisabeth bersivên pirsên we yên di derheqê "mafên penaberî û biyaniyan, mafên malbatî û mirasê, Mafên dukandarî û dezgehên aborî, mafên mulkiyet û kirêciyê û mafên bacê (skatt) de, wê di quncika huqûqî ya Berbangê de binivîse.

Hemû xwendevanên Berbangê yên li Swêdê dijîn dikarin pirsên xwe bi nivîskî bişînin adresa Berbangê. Divê tu nama xwe li ser nasnava "JURISTEN SVARAR" binivîsîne ku nama te devgirtî û yekser bigihê destê avukat Elisabeth Fritz.

Em li ser navê Federasyonê, Berbangê û li ser navê gelê Kurd sipasiya Elisabeth Fritz dikin ku ew vê alîkariya hêja pêşkêşî xwendevanên Berbangê dike. Û herwisa em hêvîdarin ku xwendevanên Berbangê pirsên xwe bi nivîskî bişînin.

Şirketa Pardarî (Aktiebolag): Şirketa pardarî divê (mecbûrî) bê qeydkirin. Ew jî li ba Daîra patent û qeydkirinê PRV (Patent -och registrerings verket-PRV) kû li Sundsvälê ye, tê kirin. Herî kêr 50.000 (pêncî hezar) kron sermiyan tê berpêşkirin. Lê belê tu dikare ji dêvla pera malhebûneke din, bi buhayê 50.000 hezar kronî berpêş bike. Ev jî rê vedike ku wek mînak mirov ji firma şexsî tiştê (çşya an pere) bi dest xistibe, mirov dikare wan wek sermiyan ji bo şirketa pardarî bikarbîne. Ji bilî pera tişt, sermiyanê vehewandî (apportbildning) tê binavkirin. Di şirketa pardarî de pêwîst e ku rewîsorekî, resmî, yan jî resmî qebûlbûyî, hebe. Gelek kes weha bawer dikin ku hişkpereyên tê razandin nayê tevdan jî. Lê (ya rastî) mesele ne weha ye. Ji bilî wê mirov dikare bi wan peran mal bikire, tiştên dikanê temam bike û mesrefê lê bike. Li aliyê din, ji nêvî bêtir sermayanê şirketê hatibe bikaranîn jî, dikare şirketê betal bike. Malhebûna şirketê, (tiştên) wê û pereyê hişk yê mayî ku şûna nêvî yê sermiyan dadigre, bes e.

Di şirketa pardarî de demên hesabê salawextî dikare cihê cihê bin. Wek 31/12 yan 30/4, yan 30/6 û yan jî 31/8 an dikare bibin demên hesabên salawext. Başiya (fêda) vêya ev e ku mirov dikare li gor a demên baş û xerab yê karkirina şirketê, hesabê xwe yê salwextî bide. Mirov dikare hinekî ji qezencê, ji bo di rojên desttengiyê de bikaranîne, bide alîkî. Di şirketa pardarî de tu karker î. Bi vî awayî şirket, ji bo te, mesrefên sosyal wek mesrefa xwediyê kar uhw. û bi vê re baca cara yekem hesabandî bi mûçê te re dide. Şirketa pardarî xwediyê şexsiyeteke hiqûqî ye.

Gava mirov nexwaze aboriya xwe ya şexsî rakêşe nav kar, yan jî pardar gelekbin, baştir e. Mirov şiklê şirketa pardarî hilbijêre.

Şirketa pardarî, bi riya qanûnê, hem jî bo mafên sivil, hem jî ji bo mafên mulkî baş hatiye hûnandin. Şirketa pardarî bixwe tê backirin û baca dewlemendiya xwe, bi xwe dide. Ji %30 yê hatina xwe bacê dide û li gora welatên din jî ev kêr e. Tevlî imkanên parastina hinek ji qezencê dikare bibe %23.

Cûreyên (Şirketan yên) din: Bêyî kû mirov hûr lê nenere, karûbarên

muayen bi şiklên yekîneyên aborî, fikrî û weqf, wek şirketên basît tèn binavkirin. Yekîneyek aborî xwediyê şexsiyeteke hiqûqî ye û armanca bidestxistina qezencê ji pardaran re dide ber xwe. Bac li wê (yekîneyê) bi xwe tê birrîn. Ji qezenca tê parkirin heta %30 jê tê birrîn. Yekîneyên ku armanca wan ne qezenckirina pera ye jî xwediyê şexsiyeteke huqûqîne xebata wan ser bi siyaset, çand, werzî û dîn in. Cûreyek din ya şirketa ku binavê şirketa Basît tê naskirin, ne xwedî şexsiyeteke hiqûqî ye. Di şiklê şirketa bazirganî neqeydkirî de ye. Bazirganiyê na ke, wek numûne: Şirketa pişkîşandinê û (li ser tişkî) sertgirtinê.

Wekî din jî: Tu kîjan cûreyên ticaretê helbijêre jî divê tikiliyên te bi danîşmanekî baş re he be. Ji bo pirsên hiqûqî bi hiqûqzanekî û ji bo pirsên bacê, deftergirtinê, hesabê salane û bacdaxuyankirin (dekleration) ê, bi kesên pisporên van karan re têkilî ye deyne. Eger di şirketê de tu ne bi tenê bi, bi hevalê xwe yên şirketê re peyma-nên nivîskî ji bir me ke.

Wergêr: Hemit Kilicaslan

SAHLSTRÖM JURIDISKA
BYRÅ AB

Har öppnat motagningskontor
för Dig som bor i Södertälje.

Elizabeth Fritz är bemannad på
kontoret varje tisdag mellan
kl.12.00 - 20.00 och varje fredag
mellan kl. 9.00 - 17.00

Elizabeth Fritz talar syrianska
och kan även erbjuda Dig juridik
på detta språk.

Adres:

Sahlström Juridiska Byrå AB
Västmannagatan 66, 113 25

Stockholm

Tel: 08- 30 54 00

DI DESTPÊKA SEDSALA 20- Î DE DAMEZIRANDINA HINEK KOMELEYÊN KURDÎ

Zinar Soran

Berî şerê Cîhanê yê yekem, "Kurdistana Rojava" yekem bû û di bin nîrê Împeratoriya Osmanî de bû. "Kurdistana Rojhilat" jî, di bin destê împeratoriya Îranê de bû. Di dawiya sedsala 19- î de, paytextê împeratoriya Osmanî Stanbolê ji bo Tevgera Kurdî jî bûbû navendiyek zor girîng û taybetî. Gelek zane, ronakbîr û xwendekarên Kurd, ji ber sedemên cûrbecûr li wê derê civiyabûn. Di nava wan de, kesên ji malbatên malmezînan û feodalên Kurdan jî hebûn. Hinek ji wan malmezînan, piştî serhildanên ku bi ser neketibûn surgûnê Stanbolê bûbûn. Lê gelek kesên dewlemend û zarokên serokeşîran jî, ji bo xwendinê li wê derê diman. Sultan Ebdulhemîd ji bona sultantiya xwe biparêzê û piştigiriya xwe di nava Kurdan de xurt bike; di sala 1891- ê de, di bin serokatiya hinek serokeşîran de û bi navê "Siwarên Hemîdî" 36 "Alayên Siwarên Hemîdî" saz kiribû. Herweha di wan salan de, ji bo perwedekirina zarokên eşîran, bi navê "Dibistana Eşîra" du dibistan hatibûn vekirin. Yek ji wan li Stanbolê û ya din jî li Bexdadê bû. "Dibistana Eşîra" ya li Stanbolê, di sala 1892- an de hatibû vekirin û di wê dibistanê de li gel zarokên malmezînan, xanedan û serokeşîrên Arnevût û Ereban, gelek zarokên beg û serokeşîrên Kurdan jî, dest bi xwendinê kiribûn (1).

Neteperweriya ku bi Şoreşa Fransayê ya di sala 1789- an de dest pê kiribû, di dawiya sedsala 19- î de xwe gihandibû nava wan gelên di bin nîrê împeratoriya Osmanî de jî. Bîrûbaweriyê neteweyî û niştîmanperwerî di nava wan gelan de û bi taybetî di nava zana û ronakbîrên wan de roj bi roj geştir û xurtir dibû. Ev bîrûbawerî, di nava rewşenbîr û zanayên Tirkan jî be-

lav û bu. Gelek rewşenbîrên Tirk li dijî sultanên Osmanî dixebitîn û dixwestin dewletek xûrî Tirk pêk bînin. Heta hinek ji wan li dû xewna "pantirkîzmê" de bûn ku hemû Tirkên li Dinyê di nava yek dewletê de bicivînin.

Di sala 1886- an de Ermeniyên bi navê "Hinçak" rêxistinek damezirandibûn. Di 3- ê Hezîrana 1889- an de jî, li dibistana "Tibbiye-î Şahane" bi navê "Komeleya Yekitiya Osmanî" (Ittîhad-î Osmanî Cemiyetî) rêxistinek hatibû saz kirin (2). Ji pênc sazkarên wê rêxistinê Ibrahîm Temo, Arnavût; Muhamed Reşîd, Çerkez; Maxmûmî, Erebi; Abdullah Cewdet û Ishaq Sukûtî jî Kurd bûn. Lê gava rojnâme Osmanî bahsa wan dike; Ishaq Sukûtî wek Tirk nişan dide (3). Ev rêxistin ne li ser bingehê netewetîya Tirk, li ser esasê Osmanîtiyê hatibû ava kirin û damezrevanên wê li ser bingehê zilm û zordariya Sultan Ebdulhemîd ji holê rakin hatibûn cem hevdu. Rêxistin ne xwediyê programek siyasî û civakî ya zelal bû. Herweha; di destpêkê de, "Komeleya Yekitiya Osmanî" cudayî nexistibû nava neteweyan û baweriyên olî.

"Komeleya Yekitiya Osmanî" di eynê salê de, têkiliyê bi serokekî "Tirkên Ciwan" Ahmed Riza Beg re datîne û navê rêxistinê dibe "Komeleya Yekitiya û Pêşketina Osmanî" (Osmanî ittîhad ve Terakkî Cemiyetî). Armanca wê rêxistinê, di xala duyem ya programa de weha hatiye nivîsandin: "Armanca Komelê pêkanîna menfaetên giştî ye; cudatiyê naxîne nava netewe, netewetî, cinsiyet û mezheban. Endam di bawerîya xwe de azad û serbixwe ye. Ji derveyî menfaetên giştî bi tu fermanan ve ne girêdayî ye." (4).

Lê gava "Tirkên Ciwan", piştî îlan- kirina "Meşrûtiyeta duyem" hatin ser hukûm; li gorî wê armanca li jor hatiye nivîsandin, nemeşîyan û her ku çû bêtir

siyasetek nîjadperestî û pantirkîzmî meşandin. Bê guman, ev siyaseta wan bû sedemê ku neteweyên din û herweha zana û ronakbîrên Kurdan ji wan dûr bikevin. Di wê derheqê de, O.L. Vilçivski weha dinivîsîne: "Di sala 1908- an de, wextê Tirkên Ciwan hatin ser kirdayetiye, siyaseta wan a nîjadperestî riyek wisa danî ber wan ku Kurd ji wan dûr bikevin. Di wê dîrketinê de, wezîfeke din ket ser milên tevgera Kurd; di Kurdistanê de wezîfa xebatê kirin li dijî desthilata Tirk û ji bo peyda kirina azadî û serxwebûnî, ji împeratoriya Osmanî qetandin" (5).

Ronakbîr û niştîmanperwerên Kurdan piştî Meşrûtiyetê bêtir hewil dan ku, komeleyên xwe yê Kurdî saz bikin. Berî îlan- kirina Meşrûtiyetê jî, hinek ronakbîrên Kurdan di bin tesîra bîrûbaweriyên neteweyî û niştîmanperwerî de mabûn û di wî warê de dest bi xebatên siyasî û çandî kiribûn.

ROJNAMA YEKEM YA KURDÎ "KURDISTAN"

Rojnameya yekem ya Kurdî, bi navê "Kurdistan", di 22- ê Nîsana 1898- an de ji alî Mîqdad Mîthath Bedîrxan ve, li Misrê hatiye weşandin.

Ew rojname bi Kurdî û tirkî derdiket. Sazkarê rojnâmê Mîqdad Mîthath Bedîrxan armanca rojname Kurdistanê, di hejmarê yekem de weha nivîsandîye: "Vê cerîdê de, ezê bahsa qenciya ilm û marîfetê bikim; li kû derê mirov dielime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene, ezê nişa Kurda bikim; li kû derê çî şer dibe, dewletên mezin çî dikin, çawa şer dikin, ticaret çawa dibe; ezê hemiya hikmat bikim" (6).

Bê guman derxistina rojname "Kurdistan", di dîroka Kurdistanê de xwedî cihekî taybetî û zor girîng e. Weşandina wê rojnâmê di nava Kurdan de kêfxweşî û dilşahiyeke mezin çêkiriye û nav û dengê wê di navê Kurdistanê de gelekî belav bûye. Lê rejîma Sultan

Ebdulhemîd di destpêkê de, bi diji wê rojnamê rawestiyaye û qedexa kiriye ku ew di nava sinorên dewleta Osmanî de bête belav kirin. Di wî warî de, M. Emin Bozarslan weha dinivîsîne: "Wezîrên karên Hundirîn belavokeka resmî ji wezîfedarên dewletê ra şandiye û bi wan daye zanîn ku rojnama "Kurdistan" di nava sinorên dewleta Osmanî da hatiye qedexekirin, ji wan xwestiye ku wê biryara qedexekirinê pêkbinin" (7). Ji ber zilm û zordariya Osmanî, Mîqdad Mîthat Bedirxan piştî hejmarê 5- an rojnamê teslîmî birayê xwe Ebdurahman Bedirxan dike û ew vedigere Stanbolê. Ebdurahman Bedirxan ji bo weşandina wê rojnamê bidomîne, neçar dimîne ku cihê rojnamê ji Misrê rake û derxistina wê li Swîsre, li bajarê Cenevreyê didomîne. Lê guherandina cihê rojnamê ji, zulm û zordariya rejîma Sultan Ebdulhemîd ya li ser rojnama "Kurdistan" û malbata Bedirxaniya kêma nekiriye. Ji hejmarê 20- î û pê ve rojname dîsa vegeriya Misrê. Ji hejmarê 24 an û pê ve rojname li Îngilîstan, li bajarê Londra û Folkstanê derketiye. Hejmarên 30 û 31- ê, dîsa li Cevre derketine. Bi kurtayî, rojnama "Kurdistan" ji ber zulm û zordariya rejîma Ebdulhemîd, li tu derê bi awakî dirêj ciwar nebûye. Heta niha 31 hejmarên rojnama "Kurdistan" hatin peyda kirin û ji derveyê hejmarên 10, 12, 17, 18, û 19- an, hejmarên din ji alî M. Emin Bozarslan ve, teva wergêra tîpên latîni ji nû de hatine çap kirin.

KOMELEYA VÎNA ZEXM YA KURDISTANÊ

(Kürdistan Azm- i Kavî Cemiyeti)

Li gori agahdariyên ku Zinar Silopî dide; komeleya pêşîn ya Kurdî di sala 1900- î de, bi navê "Komeleya Vîna Zexm ya Kurdistanê" li Stanbolê hatiye damezirandin. Danerê wê Komelê Fikrî Efendiyê Diyarbekirî ye. Yek ji endamê wê Komelê ye ku tê nasîn jî; Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licîyî ye. Ji ber zilm û zordariya Sultan Ebdulhemîd, Kurdîzade Ehmed Remzî Beg di sala 1904- an de, îltîcayî Misrê kiriye û li wê derê, li ser navê wê Komelê xebitiye. Herweha ew li Unîversîteya "El-Ezhar" û di beşê Kurdî de xwendiyê û tîkiliyên wî "Tirkên Ciwan" re çêbûye. Piştî îlankirina Meşrûtiyetê, ew vegeriya Stanbolê û gerîndetiya (midûrtiya) wê dibistana ku ji aliyê "Komeleya Kurd ya Belavkirina Zanîne" (Kürt Neşr-î Maarîf Cemiyeti) ve hatibû vekirin, kiriye. Gelek berhemên

hêja afirandiye. Rojên xwe yê dawî di nava Kurdên Şamê de derbas kiriye û mezelê wî di nava goristana taxa Kurdan de ye (8).

Wer xuya ye, ku ew Komele ji ber zilma Sultan Hemîd nebûye xwediyê jiyaneke dirêj. Lê mixabin di derheqê wê de, di destê me de ji dervî wê agahdariya kurt ya Zinar Silopî pê ve, tu agahgarî û zanînek din tune ye.

MEŞRÛTIYETA DUYEM Û DAMEZIRANDINA KOMELEYÊN KURDAN

Di destpêka sedsala 20- î de, rewşa împaratoriya Osmanî gelek nexweş bûbû û di nava kirîzek pir mezîn de bû. Dewletên Ewropî dizanibûn ew împaratoriya di ber sikrata mirinê de ye û hesab û planên dabêşkîra wê dikirin. "Komeleya Yekîti û Pêşketina Osmanî" jî dixest ji wê rewşê istifade bike û ji Sultan Ebdulhemîd daxwaza îlankirina Meşrûtiyetê kirin. Di wê reşax nexweş de, Sultan Ebdulhemîd neçar ma ku di 24- ê Tîrmeha 1908- an de, "Meşrutiye-ta Duyem" îlan bike.

Bi îlankirina Meşrûtiyetê; di warê siyasî de, rewşek nû û taybetî çêbûbû. Zana, rewşenbîr û navdarên kurdan jî nexwestin ji wê rewşa nû bê par bimînin û ji bo damezirandinê Komelên siyasî û kulturî dest bi xebatek germ kirin.

KOMELEYA HEVKARÎ Û PÊŞKETINA KURD (Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti)

Di 19- ê Îlona 1324 (1908)- an de, li Stanbolê "Komeleya Hekari û Pêşketina Kurd" (KHPK) ji alî hinek zana, rewşenbîr û malmezînan kurdan ve, hate damezirandin. Hinek damezre- van û berpirsiyarên wê Komeleyê ku tên zanîn ew in: Seyîf Abdulqadir, Emin Elî Bedirxan, İsmail paşazade Muşîr Ahmed Paşa, Zihnî Paşayê Baban, Damat Ehmed Zulkuf Paşa, Xelîl Xeyalî, Ehmed Cemîl Begê Diyarbekirî, Ehmed Remîz Begê Licî, Dr. Şukru Mehmet Sekban... (9).

Gava mirov li damezre- vanên Komelê dinere; xweş tê dîtîn û diyar e, ku Komele di giranî û pêşengiya dere- beg û malmezînan kurdan de, lê ji alî hinek kesên malmezînan û rewşenbîrên kurdan ve, hatiye ava kirin. Yek ji wan rewşenbîr û damezre- vanên wê Komelê jî, Dr. Şukru Mehmet Sekban bû. Berî ku ew li ber destê Mustefa Kemal Atatürk tobe bike; çî di damezrandin û xebata wê Komelê de be û çî jî di ava- kirina Komeleyên Kurdan yê din de be, wî xebatek berbiçav û hêja kiriye.

Lê mixabin dûre, ew di sala 1923- an de bi nameyek vekirî poşmaniya xwe dide diyar kirin û ji bo xwe bi Atatürk bide efû kirin, dest bi înkara neteweya Kurd dike û huwiyeta xwe ya neteweyî bi destê xwe dixê bi qeyd û zincîrên kole- tiya kolonyalistên Tirk. Dr. Şukru Mehmet Sekban di sala 1933- an de, bi fransî pirtûkekê bi navê "La Question Kurde- Deas Problèmes Des Minorités" (Pîrsa Kurdî- Pîrsgirêkên Eşqelyetan) pirtûkekê derdixîne. Di wê pirtûkê de, tu bêhna welatpariziyê êdî ji wî nayê; bi ruhekî koletî înkariya ne- teweya Kurd dike û Kurdan bi malba- tiya Tûraniye bi nav dike: "Di rastiya xwe de, Turk û Kurd ji navekî pê ve tiştêkî din îfade nakin; navê malbata me Tûrani ye" (10). Herweha, Dr. Sekban di wê pirtûkê de, hinekî bahsa rew- şa damezirandin û hîlbijartina Komîta Birêvebir ya "Komeleya Hekari û Pêşketina Kurd" jî dike: "Piştî Qanûna Esasî ya Osmanî ya 1908- an, di dema damezirandina "Komeleya Hekari û Pêşketina Kurdistanê", li ser bangkirina hinek xwaneyên Kurdan ez bi rev çûm civîna yekem. Ez yek ji wan propogandîstê herî baş bûm. Di hîlbijartina Komîta Birêvebirinê, piştî Naim B. Baban, dengên herî bêtir min girt" (11).

KHPK di demek kin de, di nava Kurdan de belav dibe; li Diyarbekirê, Bitlisê û Mûsilê liqên wê tê damezirandin. Liqên Bitlisê û Mûsilê di 17- ê Çiriya Paşîn de hatin vekirin. Serokê Komeleya liqê Diyarbekirê, Muftî Suphî Efendî bû (12). Di warê liqê Bitlisê de, Dr. Celîl Celîl weha dinivîsîne: "Kuluba Bitlisê mezintirîn û xurtirîn wan kluban bû. Di Çiriya Duyem a sala 1908 an de, li vî bajarî kluba Ermenîyan 50, ya İttihadiyan 90 û ya Kurdan jî 680 endamên wê hebûn. Cîgirê konsolosê Rusya Akîmovîç di rapora xwe ya 30 ê Çiriya Paşîn de weha dinivîsîne: "Hejmarên endamên kluba Kurdan gihîştîye çend hezaran..." (13)

Armanca KHPK, di xale yekem ya destûra wê de weha hatiye nivîsandin: "Ji bona; ji Kurdên ku hay ji rastiya qaide û menfaetên Qanûna- Esasî ya li gorî hukmên bilind yê îslamî ku bextewariya netewe û selametiya Welêt dixê bin garantiyê, bahs bike û li gel her gav parastina bilinddayiya sîfatê Osmanî, bi parastina sistema parlementeriyê ku sedemê pêşveçûna ol û millet û jiyane ye, girêdayiya Kurdan bi meqamê bilind yê xelîfet û patîşahiye bêtir xurt bike; bi hemwelatiyên Ermenî, Nastûrî û xelkên din yê Osmanî re xweş derbas bike û tîkiliyên wan pêşdetir bibe; nakokî û dijminatîyên di nava eşîr û êlan de rake û mercên pêşdebirin û geşkirina hemûy-

an bi yek carê û li derdora navendiyek meşrû de, pêk bine; perwerdekirin, senayî, bazirganî û cotkariyê belav bike û bi rêk û pêk bike, bi navê "Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd" komeleyek xêrê hatiye damezirandin" (14).

Destûra KHPK, ji 27 xalên bingehî û xalek awarteyî pêk hatiye. Destûr bi tirkîya kevî (osmanî) hatiye nivîsandin. Ji bo rewş û hinek hedefên wê Komeleyê bêtir bê zelal kirin; ez çend xalên wê destûrê li jêr dinivîsinim:

Xal 10:- Komele, li Stanbolê wê vê gavê bi kurdî û tirkî rojnameyek hefteyî çap bike.

Xal 13:- Komele wê pir bixebite, ku zimanê resmî tirkî di dibistanan û nava Kurdan de bide xwendin.

Xal 14:- Wê bi diqat li ser bê rawestandî, ku heta niha çî berhemên kurdî yê çapkîrî û neçapkîrî hene, bê kom kirin û civandin, bê belav kirin û xwendin û diroka edebiyata kurdî wek pirtûk bê weşandin.

Xal 16:- Ji ber pêwîstiya perwerdekirina bir û bawerî û civakî ya Kurdan; çî ji bo meclis-î mebusana yekem û çî ji, ji bo hîlbijartinên parlamentoyên pêşerojê, wê hewil bê dan, ku nûnerên bikaribin wê hukûka bi Qanûna Esasî hatiye dayin, biparêzin û hewce-dariya Welêt bi cî binin, bê hîlbijartin. Di wî warî de weşan û programên pêwîst, wê bê weşandin.

Xal 17:- Wê liqên Komeleyê li wîlayet, sancaq û qezayên ku kurd lê cîwan in, hebin. Her liqek, wê komîteyek wan ya şewrê û birêvebirinê û endamên wê yê cîgir hebin....

Berdewama xala 7. an ya Destûrê:

Komeleya me, merhûm berêz Şêx Abdullah Efendîzade Seyyid Abdulkadir Efendî serokê yekem û zavayê Xanedaniya Osmanî merhûm berêz Îsmail Paşazade muşîr Ahmed Paşa jî, serokê duyemîn hîlbijartiye. Serokatiya yekem, heta ku sax be, ji payedarê mezin mîrze Seyyid Abdulkadir Efendî re ye. Gava ew ne hazîr be, wê payedarê mezin mîrze Ahmed Paşa, vê vatiniyê bi cî bine."

Gava ku mirov li destûra KHPK dinere; xweş tê diyar kirin, ku siyaseta û armanca wê komelê di çarçewa resmî ya Osmanî de sinorkirî bû. Ji xwe hinek damezrevanên wê bi xwe jî, ew kesên nezîkî Sultanê Osmanî û Serayê bûn. Wek tê zanîn, ew komele bi awakî resmî û eşkere hatibû damezirandin.

ROJNAMEYA "KURD TEAVÛN Û TERAKÎ"

Ji damezrevanên Komeleyê, Xelîl Xeyalî, Mîrî Katîpîzade Cemîl û Kurdîzade Ahmed Ramîz bi taybetî, ji bona

perwerdekirina zarokên Kurdan dibistanekê vedikin û bi komelê ve girêdayî Çapxana Kurdî ava dikin (15). Herweha, Komeleyê bi navê "Kurd Teavûn û Terakî" dest bi weşana rojnameyekê dike. Li gorî agahdariyên Dr. Celîlê Celîl ku jî çavkaniyên cihê civandiye; hejmara yekem ya rojnamê di 29-ê Çîrya Pêşîna 1908 - an de derdikeve. Lê di wan agahdariyan de, navê rojnamê "Kurd" hatiye nivîsandin. Zînar Silopî jî, di pirtûka xwe de, navê wê rojnamê, "Kurdistan" nivîsandiyê. Dîsa, li gorî Dr. Celîlê Celîl dinivîsin: "Yê ku ew rojname derxistiye navê wî Tewfîq Bûye û xelkê Silêmaniyê Bûye. Di rûpelê rojnamê ya yekem de wiha hatiye nivîsandin: "Rojname organa Komeleya Hevkarî û Pêşketin a Kurd e û armanca wê ya bingehîn jî belav kirina bir û bawerîya Komelê ye." Heftê carekê derdiket û her rûpelek çar sûtûn bû. Wê rojnama han tenê neh meh derketiye..." (16).

"Komeleya Yekîfî û Pêşketina Osmanî" ku di wê demê de li ser iktidarê bûn, di 17-ê Nîsana 1909- an de, bi hinek rêxistin û komeleyên xelkên ku di bin destên Împeratoriya Osmanî de bûn, bi navê "Lijna Hevgirtina Osmanî" (Heyet-î Muttefika-î Osmanîye) hevkarîyêkê pêk tîne. Bi navê wan rêxistinên beşdar daxuyaniyek tê belav kirin û di wê daxuyaniyê de, sedem û armancan wê hevkarîyê tê diyar kirin. Yek ji wan komeleyên ku îmtiza wan li binê wê daxuyaniyê heyê, "Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd" e. Ew daxuyaniya, di pirtûka Tarîk Zafer Tunaya de hatiye belav kirin (17).

Lê hevalbendên "Komeleya Yekîfî û Pêşketina Osmanî" ne li gorî wê hevkarî û peymanê siyaseta xwe dimeşandin; piştî demek kurt, wan rûyê xwe yê rastî derxistin holê û dest bi girtina Komeleyên Kurdan kirin. Ji ber ku wan, KHPK û liqên wê yê li Kurdistanê jî bo pêşketin û xurtbûna xwe astengê girîng diditin. Berberî û nakokiyên di nava pêşengên "Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd" yê malmезin; bi taybetî reqabet û berberiya di nava Seyid Abdulkadir û Bedirxaniyan kês û firsendek baştir dida kerbidestên Osmanî ku bêtir bi hêsanî êrişê bine ser wê komeleya Kurd. Loma jî, ew Komeleya yekem ya Kurdî ku piştî Meşrûtiyeta Duyem hatibû ava kirin, nebû xwediyê jiyaneke dirêj û di sala 1909- an de, ji alî "Tirkên Ciwan" ve hate girtin. Bi girtina Komeleyê, dibistana ji alî Xelîl Xeyalî û hevalên wî ve hatibû vekirin û rojnama "Kurd Teavûn û Terakî" jî, hate girtin. Bazîl Nikitin dinivîsîne, ku "Tirkên Ciwan di sala 1909- an de, komele û dibistana Kurd ya li Çemberlitaş dan girtin" (18). Li ser

girtina KHPK, Dr. Celîlê Celîl jî, weha dinivîsîne: "Havîna sala 1909- an de, dema Tirkên Ciwan dest avêtin siyaseta Osmanîzmê, hêdî hêdî klubên Kurdan girtin. Îttihad û Terakî jî bo fireh kirin û xurt kirina iktidara xwe, pêwîst dît, ku Kurd bibin endamê klubên wan..."

"Li gorî wan deng û behsên ji Mûşê gihîştine redaksiyona rojnama Horizon a Ermenîyan, piştî girtina wan klubên, Kurd li der û dorên hicrên dînî dicivîyan û dest bi xebatek pîr bi dizî kiribûn. Li navça Bilanix, Mclazgîrd û cîyên din civîn dikirin û li ser mesela programa xebatê û babetên din yê kar û bar diaxivîn..." (19).

Teva ku "Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd" nebû xwediyê jiyaneke dirêj û teva wan berberî û nakokiyên di nava pêşengên malmезinên Kurdan jî; KHPK di warê şiyarkirina gelê Kurd û ziman û kultura kurdî de, xebatek gelek heja û giranbiha kiriye. Herweha ew xebatên siyasî û kulturî yê wê Komelê, ji bona xebat û damezirandina Komeleyên din yê Kurdan jî, bûye bingeh û pêlikek girîng û berbiçav...

KOMELEYA BELAVKIRINA ZANÎNÊ YA KURD (Kürt Neşr-î Maarîf Cemiyeti)

Piştî girtina "Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd", di sala 1326 (1910)- an de, li Stanbolê ji alî rewşenbîrên Kurdan "Komeleya Belavkirina Zanîne ya Kurd" (KBZK) hate damezirandin. Di destûra KBZK de, armanca û hûnandina wê hatiye diyar kirin. Ji xwe, Destûrên (nizamnameyên) komeleyên di wê demê de hatine damezirandin, hem programa û hem jî rêzname wan komeleyan bûn. Destûra KBZK jî 34 xalan pêk hatiye. Ji bo armanca û karakterê wê Komeleyê dide diyar kirin, ez her sê xalên pêşîn yê wê destûrê li jir dinivîsinim:

Xal 1:- Li Stanbolê bi navê "Komeleya Belavkirina Zanîne ya Kurd" (Kürt Neşr-î Maarîf Cemiyeti) Komeleyek îlmî, edebî û sinai ya navendî hatiye damezirandin.

Xal 2:- Armanca û heviyên Komelê yê pîroz; di nava ewladên ku ji nîmetên perwerdekirinê herî bê par Kurdan de, perwerdekirin û senayiyê belav bike û pêş de bibe.

Xal 3:- Komelê wê vê gavê hewil bide, ku li Stanbolê dibistanên pêşîn yê taybetî ji bo zarokên Kurdan veke û pêş de bibe; gava bi alîkariya endamên Komelê û alîkarxwazan rewşa aborî bê qonaxek têr, wê li bajar û gundên ku piraniya rûniştvanên wan Kurd in û bi taybetî di nava êl û eşîrên mazlûm de, dibistan bê vekirin û ste-

wandin ku paşdemayina wan ji holê bê rakirin" (20).

Tarik Zafer Tunaya di vê pirtûka xwe ya li jêr navê wê derbas dibe, bi sernavê "Talimnameya Kürt Neşr-î Maarif Cemiyeti" belgeyek weşandiye. Li gorî wê belgeyê; destûra "Komeleya Belavkirina Zanîne ya Kurd" ji 15 xalan pêk hatiye û damezrevanên wê ev in:

"Bedirxanzade Emin Eli Beg, Dr. Abdullah Cevdet Beg, Bedirxanzade Mithat Beg, mebûsê Erzuromê Seyfullah Beg, mebûsê Hekarî Taha Efendî, mebûsê Wanê Tefîq Beg, Bedirxanzade Abdurahman Beg, mebûsê Gencê Mehmed Efendî, Mir Seyfetînzade Huseyin Ewnî Beg, Miralay Mahmûd Samî Beg, memûrê Mahkema Şerîyê ya Misrê Mehmed Faiq Efendiyê Diyarbekirî, Bediuzzaman Saîd Efendî, Xelîl Xeyalî Efendî yê Mutkî, Kurdîzade Ahmed Ramîz" (21).

Wek min li jor jî nivîsîbû, "Nizamnameya" (destûra) "Komeleya Belavkirina Zanîne ya Kurd", ne ji 15 xalan, ji 34 xalan pêk hatiye. Destûra ku di destên min de ye, di sala 1326 (1910) an de, li "Matba-î Amedî" hatiye çap kirin. Xala ku T. Z. Tunaya wek xala 15 an û ya dawîn nîşan dide; di destûra Orjînal de, wek xala 34 an ya dawîn hatiye nivîsandin.

Gava mirov li destûra Komelê dinere; mirov dibîne, ku KBZK xwestiye li wîlayet, qeza, nehya û gundan, kulûb û liqên xwe damezirîne û di nava wan de tevgerîdanek navendî pêk bîne. Her weha, li gorî rewşa Komeleyê ya aborî, fabrîkê û ticaretxaneyên senayî û ticarî veke...

Rewşenbîrên Kurdan li gorî wê armanca ku di destûra KBZK de hatibû nivîsandin; li Stanbolê bi navê "Dibistana Meşrûtiyê" dibistanekê vedikin. Dr. Celîlê Celîl dinivîsîne, ku "Ew dibistan li taxa Diwan Yolu û li kuşa Hacı Paşa hatibû vekirin. Rolek wê ya mezîn di jiyana çandî ya Kurdên Îstebol de hebû...Serokê dibistanê Abdurahman Bedirxan bû, di destpêkê de tenê 30 zarokên Kurdan hebûn, dawiyê hijmaran wan gelek zêde kirine" (22). Lê li gorî Zinar Silopî dinivîsîne; Mudûrê wê dibistanê, Kurdîzade Ahmed Ramîz e (23).

"Komeleya Belavkirina Zanîne ya Kurd" jî, nebû xediyê jiyaneke dirêj. Îtîhad û Terakkîyan tehamulî wan xebatên edebî û kulturî jî nekirin û ew Komele jî, piştî demekê kurt dane girtin...

KOMELEYA HEVKARIYA KURDISTANÊ (Kürdistan Teşrik-î Mesai Cemiyeti)

"Komeleya Hevkariya Kurdistanê" (KHK) di sala 1328 (Mîladî 1912)-an de hatiye damezirandin. Armanç û çarçewa xebatê ya "Komeleya Hevkariya Kurdistanê" di xala duyem û sêyem de ya destûra wê de, weha hatiye nivîsandin:

"Xal 2:- Li gel her gav parastina bilindayîya sîfatê Osmanî, bi parastin û pêşdebirina sistema parlementeriyê ku sedemê berbiçav yê pêşveçûna ol, dewlet û millet û azadiya jiyane ye, girêdayîya Kurdan bi meqamê bilind yê xelîfet û patîşahiye bêtir bike; bi hemwelatîyên Ermenî, Nastûrî û xelkên din yê Osmanî ve xweş derbas bike û tîkiliyên wan geştir bike; kîn û berberiyên di nava êl û eşîrên de rake û aşîti û biratiyê bi cî bike; ji bo mercên pêşdebirin û jiyaneke bi aheng bi hevdû re hemûyan bi yek carê li derdora navendiyek meşrû de pêk bîne, senayî, cotkarî û bazirganiyê belav bike û pêş de bibe; ji bo ketina dibistanên li gorî dilê wan, rênişandaniya xwendekarên ku wê ji Kurdistanê werin bike û hêsaniyê ji bo wan çêbike û mesrefên perwedekirina kesên ku rewşa wan ya aborî ne xweş bin, temîn bike".

"Xal 3:- Heger pêwîstiyek zarûrî çênebe, Komele wê ji binî de bi siyaseta giştî mijûl nebe" (24).

Gava mirov li destûra vê Komelê dinere û dide ber "Komeleya Yekîti û Pêşketina Kurd", mirov dibîne ku di bingehî de, armançên herdu Komeleyan hevdu digrin. Ew formulasyona li jor ya di destûra herdu Komeleyan de hatiye nivîsandin, kêmkê zêde di destûrên hinek komeleyên Kurdan yê din jî tê dîtin.

KOMELEYA XWENDEKARÊN KURD HÊVÎ

"Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî" di sala 1912- an de, li Stanbolê hatiye damezirandin. Bazil Nikitin û M. Emin Zekî tarîxa damezirandina wê, 1910 nivîsandin. Bazil Nikitin di wî warî de weha dinivîsîne: "Tirkên Ciwan di sala 1909- an de, komele û dibistana Kurd ya li Çemberlî (taş) dan girtin. Teva vê jî, grûbek xwendekar û huqûqvan ku di 1910- an de li komeleyek nû ya bi navê Heviya Kurd de civiyabûn, dest bi weşana kovarek mehanî ya bi navê Roja Kurd kirin" (25). Lê, li gorî agahdariyên ku Zinar Silopî dide ku yek ji wan kesên da-

mezrevanên "Hêvî" ye; Zinar Silopî, Omer Cemîl Paşa, Fuat Temo, Cerahzade Zekiyê Diyarbekirî destûra "Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî" amade dikin û piştî destûra resmî ya vekirina Komeleyê ji Hukûmetê digrin, di sala 1912- an de, damezirandina "Hêvî" îlan dikin. Heta ku kongreya "Hêvî" çêdibe, bi awakî muwaqet Omer Cemîl Paşa dikin sekreterê berpirsiyar. Ekrem Cemîl Paşa û Mendûh Selîm Beg, ji destpêkê ve dibin endamê "Hêvî" û beşdarî nava xebata wê dibin. Ji ber ku bi daxwaziyek pir germ gelek xwendekarên Kurd dibin endamên "Hêvî", di demekê pir kurt de hejmara endamên Komeleyê gelekî bilind dibe. Ji nava wan endamên Komelê, mirov dikare navê Kemal Fevzî, birayê wî Ziya Wehbî, Necmeddîn Huseynî yê Kerkûkî, Babanzade Ezîz, Şefîqê Arwasî, Hemzeyê Mukûsî, Teyîb Elî yê Xarpêtî, Ebdulkerîm yê Silêmanî, Asaf Bedirxan, Mistefa Reşat yê Diyarbekirî, Dr. Mistefa Şewqî yê Mehabadî, Dr. Fuad, helbestvan Ebdurrahîm Rahmî yê Hekarî zikir bike (26).

Piştî ku "Hêvî" li Stanbolê hate damezirandin, nav û dengê wê li Kurdistanê belav dibe; tîn û tesîrêk wê ya taybetî li ser xort û xwendekarên Kurdan çêdibe. Teyîb Elî hewil dide ku li bajarê Erziromê liqekî "Hêvî" veke. Dr. Celîlê Celîl li ser berfirehbûn û tesîra "Hêvî" ya di nava gel de, weha dinivîsîne: "Bizav û xebata Komela Hîwa ya di nava gel de, ji ya Komela Hevkari û Pêşketin pirtir bi nav û deng bû. Beşa Erzurumê ku di dibistaneke navendî de hatibû damezirandin, bizav, xebat û rewşekî wê ya pir eşkere û girîng hebû. Serokê wê beşê Teyîb Elî bû. Beşekî komelê jî, li derve li Lozanê hebû" (27).

Armançên "Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî" di xalên duyem, sêyem û çarem yê destûra wê de, weha hatine nivîsandin:

"Xal 2:- a) Xwendekarên Kurd bi hevdu bidin nas kirin û di nava wan de tîkîlî, biratî û yekîtiyê pêk bîne. b) Zîman û edebiyata kurdî bi awakî ser û ber bike pirtûk û pêş ve bibe. c) Di warê bicîkirina dibistana de, rêberîya xwendekarên Kurd ku wê werin paytext bike. d) Alîkariya ew kesên ku rewşa wan ya aborî ne baş in, bike ku wan di dibistanên li gorî wan in, bidin xwendin. e) Bi kurtayî, ji bona pêşketin û pêşvebirina zanyarî û civakî ya Kurdan hewil bide."

"Xal 3:- Ji bo vê armançê; li wîlayetan liqan ava bike, kovarek bi kurdî û tirkî biweşîne; pirtûkên ku xwedî naverokên agahdariyên kêrhatî û birûbaweriyên cûrbecûr û bi taybetî ji bo

dibistanên destpêkê biweşîne; ders, gotûbêj, listikên tiyatroyê li dar xîne û bi metodên cûrbecûr û li hinek deran dibistanan veke."

"Xal 4:- Armanca Komeleyê hew zanyarî û civakî ye û ji derveyî siyaseta ye" (28).

Lê di rastiya xwe de, "Hêvî" ne li gorî xala çarem ku di destûra wê ya resmî de hatibû nivîsandin dimeşîya; ew Komele jî, wek gelek komeleyên Kurdan yê wê demê, ji siyaseta dîr neketiye û ji bo şiyarkirina neteweyî û geşkirina niştîmanperweriya Kurd, gelek xebatên heja kiriye. Teva ku "Hêvî" wek komeleyek xwendekarên Kurd û di pêşengiya xwendekarên ronakbîr yê Kurdan de hatibû damezirandin jî; têkilî û peywendiyên pêşengên "Hêvî", bi niştîmanperwer û siyasethanên Kurd yê wê demê û bi nav û deng re, gelekî xurt bûn. Wek tê zanin gelek ji wan xwendekaran bi xwe jî, ji malmezî û feodalên Kurdan dihatin û giraniya siyasethanên wê demê jî, ji malmezî, feodal û derebegen Kurdan pêk dihat...

HINEK XEBAT Û ÇALAKIYÊN "HÊVÎ"

Komeleya "Hêvî" di 6-ê Hezîrana 1913- an de, bi navê "Rojî Kurd" dest bi weşandina kovarek mehanî dîke. Li gorî agahdariyên ku Dr. Celîlê Celîl dide; 3 hejmarên wê kovare derketinê. Hejmara duyem di 6-ê Tîrmehê û hejmara sêyem jî, di 1-ê Tebaxa 1913- an de derketiye. Sernivîskarê kovarê, Ebdulkerîmê Silêmanî bû. Kovar bi kurdî û tirkî dihat weşandin û piştî hejmara sêyem navê wê hatiye guherandin û bûye "Hetawî Kurd". Hejmara yekem ya "Hetawî Kurd" di 23-ê Çîriya Pêşîna 1913- an de derketiye (29). Di wê derheqê de Zinar Silopî jî, weha dinivîsîne: "Armanç û hewildana Roja Kurd, kultura kurdî pêş ve bibe û nivîsandin û xwendina kurdî di nava Kurdan de bi cî bike... Piştî kovara Roja Kurd jî alî hukûmetê ve hate qedexa kirin, di berpirsiyartiya Hemze Beg yê Mukusî de, kovara Hetavê Kurd dest bi weşanê kir. Di wan kovaran de, xortên Kurdan nivîsandinên heja dinivîsandin... Hetavê Kurd û Komeleya Hêvî heta îlankirina seferberlika 1914- an çalakî û weşana xwe domandin. Ji ber ku bi îlankirina şerpiraniya endamên Hêvî, di çarçewa seferberlikê û xizmeta leşkerî de kirin leşker, mercên weşandina kovarê nemabû..." (30).

Komeleya "Hêvî", ji derveyî wan herdu kovaran, di sala 1913- an de, kovarek bi navê "Yekbûn" jî derxistîye. Ew kovar jî, bi kurdî û tirkî hatiye we-

şandin. Di kovara Yekbûnê de, hatiye nivîsandin, ku kovar "di hefteyekê de du caran derdikeve, têkilî siyaseta nabe. Mudirê mesûl: Îbrahîm Kurdî ye. Armanca ve rojname: Di nav koma Osmanîyan de danasîna Kurdan û bilindkirina qedr û qiymeta wan e..." (31).

Ji nameya ku "Sekreterê Giştî" yê "Komeleya Hevkariya Kurdistanê" ya di tarîxa 17-ê Çeleya Pêşîna 1912- an de û bi hejmar 43- an nivîsandîye tê zanîn, ku "Komeleya Hevkariya Kurdistanê" pêşneyara yekitiyê ji "Komeleya Xwedekarên Kurd Hêvî" re aniye: "Ji ber vatiniyên ku komeleya me ji xwe re wek armanc hîlbijartîye û hewildanên pîroz yê ku muhterem Hêviya me dixwaze pêkbîne hevdu digrin, li gorî prensîba ku (biçûk bi mezînan ve girêdayî ye) û di demek weha nazik û girîng de, ger daxwazî û armanc cihê bin jî; ji bo gihastina armancên ku hatinîn tespît kirin, pêwîstiya ku bi hevdu re, bi xûn û yekitiyê, bi navendiyek meşrû û hevbeş heye..." (32). Li gorî Nesimî Firatli dinivîsîne; "li ser wê pêşneyarê, herdu komele dibin yek û di sala 1328 (1912)- an de, bi navê "Komeleya Rênişandan û Bilindkirinê ya Kurd" komeleyek nû ava kirin" (32). Lê mixabin, ez di vî warî de, li tu agahdarî û çavkaniyên din rast nehatim. Di gelek çavkaniyên ku bahsa Komeleya "Hêvî" û ew kovarên ji alî wê de hatinîn weşandin dikin; her navê "Hêvî" tenê derbas dibe û nayê gotin ku ew herdu komele bûnin yek. Dîsa li gorî wan çavkaniyan, "Hêvî" xebat û çalakiyên xwe heta îlankirina seferberlika 1914- an domandiye û piştî Şerê Cihanê yê yekem, "Hêvî" jî nû de dest bi xebata xwe kiriye...

(Dûmahik heye)

Têbinî

(1) Ji bo dirêjaya vê bahsê binere: *Martin van Bruinessen, Şeyh, Aga ve Devlet*, rp: 227- 229. *Öz-ge Yayinlari*.

M. Şerîf Firat, *Dou illeri ve Varto Tarihi*, rp: 123- 140. *T.K.A.E Yayinlari*.

M. Emin Zeki, *Kürdistan Tarihi*, rp: 155- 156. *Komal Yayinlari*.

(2) *Tarik Zafer Tunaya, Türkiye'de Siyasal Partiler*, cilt: 1, rp: 19. *Hürriyet Vakfı Yayinlari*.

Dr. M. Şükrü Haniolu, Dr. Abdullah Cevdet ve Dönemi, rp: 25- 28. *Üçdal Neşriyat. İstanbul*.

(3) *Naci Kutlay, İttihat- Terakki ve Kürtler*, rp: 26. *Weşanxana Vejîn*.

(4) *Tarik Zafer Tunaya, b.n.d. rp: 39*.

(5) *Binere: Dr. Celîlê Celîl, Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan*, rp: 12. *Weşanên Jîna Nû*.

(6) *Rojname Kurdistan, hejmar: 1. rp: 1*.

(7) *Agahdariya M. Emîn Bozarlan, Kurdistan Cild: 1, rp:12*.

(8) *Binere: Zinar Silopî, Doza Kurdistan rp: 31- 32*.

(9) *Binere: T. Zafer Tunaya, b.n.d. rp:404*.

Dr. Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan*, rp: 74. *Weşanên Jîna Nû*.

(10) *Dr. Şükrü Mehmet Sekban, Kürt Sorunu*, rp: 28. *Menteş Basimevî, 1970*.

(11) *Dr. Şükrü Sekban, b.n.d. rp: 19*.

(12) *Ji cavkaniya rojnameya "Kürt Teavün ve Terakî" (hejmar:5, 2-ê Çîriya Paşîna 1908), Tarik Zafer Tunaya, b.n.d. rp: 404*.

(13) *Dr. Celîlê Celîl, b.n.d. rp: 83*.

(14) *Ji Destûra "Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd"*.

(15) *Zinar Silopî, b.n.d. rp: 29*.

(16) *Dr. Celîlê Celîl, b.n.d. rp: 76- 78*.

(17) *Tarik Zafer Tunaya, b.n.d. rp:206- 207*.

(18) *Bazil Nikitin, Kürtler*, rp: 334. *Özgürlük Yolu Yayinlari*.

(19) *Dr. Celîlê Celîl, b.n.d. rp: 85- 86*.

(20) *Ji Destûra "Komeleya Belavkirina Zanîne a Kurd"*.

(21) *Tarik Zafer Tunaya, Türkiye'de Siyasal Partiler*, Cild: 2, rp: 214- 215.

(22) *Dr. Celîlê Celîl, b.n.d. rp: 88*.

(23) *Binere: Zinar Silopî, b.n.d. rp: 31*.

(24) *Binere: Nesimî Firatli, Kovara Deng*, hejmar: 12, rp: 32- 33.

(25) *Bazil Nikitin, b.n.d. rp:344*.

Binere: M. Emîn Zekî, Kürdistan Tarihi, Komal Basim- Yayim- Daitim, istanbul 1977. rp: 179.

(26) *Zinar Silopî, b.n.d. rp: 34*.

(27) *Dr. Celîlê Celîl, b.n.d. rp: 92*.

(28) *Nesimî Firatli, Deng*, hejmar: 12, rp: 33.

(29) *Dr. Celîlê Celîl, b.n.d. rp: 94*.

Li gorî agahdariya Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî, ji Dr. Kemal Ehmed Mezher girtiye; hejmara çaran jî ya kovara *Rojî Kurd* derketiye û ew hejmar di 30ê Tebaxa 1329/ 1913- an hatiye çap kirin. *Binere: "Li Kürdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî" rp:53. Weşanên Jîna Nû*.

(30) *Binere: Zinar Silopî, b.n.d. rp: 41- 42*.

(31) *Ji agahdariyên Musa Anteriyên di kovara Dou, hejmar: 1, rp: 29- 30 de hatiye weşandin. Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî, b.n.d. rp: 59*.

(32) *Nesimî Firatli, kovara Deng*, hejmar: 12, rp: 33.

PROSESA GEŞBÛNA DÎROKÎ YA ZÎMANÊ KURDÎ

Nivîskar: M. Emîn Hawramanî

Wergêr: Elişêr

Di derheqê dîroka bab û bapîrên kevin ê Kurdan, Mediyana de, di keleporê serwetên rewşenbîrî yên kevin de, tu curek serokaniyên raste rast bi serê xwe, yên wek: kolandin, neqş û neqaşên nivîsandî yên kevin ên dema wan û bi navê wan, heta niha neketiye berdest, an nehatiye dîtin, an jî eger hatibe dîtin, neketiye destê xwediyê xwe yê eslî!

Eger ketibe destê kesên biyanî û ne dost ji, ewan ji ber xatirê cavên dost û yarên xwe, ku ji wan hêvî dikin, nexwestine perda veşartî ya li ser bidin alîkî û ronî û zelaliyek bêxin ser.

Ew zanistiyên di vî warî de dikevin destê me, ger çendin gelek îmkanek kêma riya ronikirina vê meselê didin destê me û çendin gelek kêma û tamam ne bin jî, lê cardin di riya kesên biyanî û yên ne dostên kurdan re dest dikevin.

Zanyariyên bi vî awayî, tik û tenê bi serê xwe, ji me re xwedî qîmet û bihayên bêsînor in. Eger em baş diqet bikin, ev berê me didin ser wan demên me yên kevin ên perde li ser hatî kişandi û ji ber vê sebebê, netîcên wan me digihînin wê baweriyê ku ew serokaniyên biyanî û yên ne dost, ku car û baran tiştek li ser kurdan ji destê wan derketibe, ji ber wê bûye, ku îmkana wan a pêşilêgirtina şetên lehiyê ya barana zanyariya kurd tunebûye, ji bo ku bi tîrek bi du armancan bidin; dîrok, serpehatî û serwetên rewşenbîrî yên kurdan bi derewên xwe vehûnandine û tiştek gelek kêma, yanî wek qemçek av ji behrek xistine ber dest.

Di riya bi awakî hûr û hûr lêkolîn û muqayese kirinê re, em ê hewil bidin bigihîjin rastiyek ku em bikarin bîr û baweriyê xwe pê binin û xwe ji sitoxwariyê rizgar bikin. Ji ber vê em ê hemû wan bîr û baweriyên ku di vî warî de hatine belav kirin û hinek ji wan zanyariyên ku di hinek serokaniyên gelek nêzik de hatine weşandin, em ê têxin ber destê xwendewaran. Hewce ye em li ser vê yekê jî dilgerm û piştrast bibin, ku ev tenê mîsalek ji wan sedan mîsalan e...

Di serokaniyên cur bi cur yên Parsî de, ji me re ev yeka han ronî dibe ku neteweyek bi nîjada xwe Arî û bi navê Mediyana li welatê Medya (Kurdistan) de nişteci bûne, di demek û mudettê çend sedsalek ji xwediyê desthilat û fermanrewayekî gelek fireh bûne. Bi awakî din, ji derveyê axa

Kurdistanê ya iro, hukmê navçê din ên Îranê destê wan de bûye û navça Parsî jî yek ji wan navçên stirabnişîna Mediyana bûye. Navek re welatê Asuriyana jî dikeve bin destê hukumdariya wan û Ninova jî dibe yek ji wan stirabnişîna Medya.

Di alîkî din de, di perawêz û belgê serokaniyên parisan de ev yeka han ber çavê me dikeve ku Medî, ji bilî ku xwediyê zmanê xwe yê taybetî bûne ku ev jî zmanê medî bûye, bi nivîsên bizmarî nivîsandinên wan hebûye û her wiha xwediyê qanûnên zîraet, mîmarî, huquq, kar û sen'etên rewşenbîrî yên dinî û rewşenbîriyên edebî yên xwe bûne. Ji ber vê jî, îtiraf bi vê yekê têt kirin ku welatê Medya herêmek ji bo xwendewarên dinî bûye û ji li wir ji navçên din ên welêt re, salê bi sedan pîrên dinî hatine şandin.

Dema ku ev serokanî tên ser behsa keleporên dinî û yên rewşenbîrî yên Mediyana, bi vî awayî dinivîsin: Medî, xwediyê serwet û keleporên edebî bûn û gelek nivîsandinên wan di vî warî de hebûne, edebiyata gelî, di ferehkirina asoya îlhama şair û nivîskaran de rolek bilind listiye. Li gel vê jî, wisa ji me re didin îspat kirin an daxwaza wan ew e ji me re bidin îspat kirin, ku herçî ew cure kelepor û serwetên edebî yên edebiyatê hebûne, hemû ji aliyê Grekiyan (Yunaniyan) de hatine talan kirin, ên bi feyde bûne, yên wek nivîsandin û muhrên kolayî, kitêbên stêrnasiyê (astronomî), huquq û mîmarîyê, ji xwe re birine û ewan jî vê yekê ji xwe re nekirine derd an di mana wan de zerarek ji wan re hebûye, tevan bi şewat an bi awakî din îmha kirine!

Eger em serokaniyên din ên di vî warî de bi kûrî bixwînin, em tê digihîjin ku hinek ji wan zanyariyên han wek hev in û pîraniya wan jî yek ji yekî diwartir in.

Madem wiha ye, hildana perdê li ser rûyê zanyariyên rasteqînî û şikê, di riya muqayese kirina zanyariyên cihê cihê yên di nav serokaniyên cure cure de hatî belav kirin, dê me bigihînin hinek nelîcan.

Her wek hinek serokaniyên parsî û gelek ji serokaniyên biyanî wek ên rojava, bi dirêjî behsa talanên Grekiyan û şewitandina bi hezaran kitêbên dinî dikin, ku ji aliyê Grekiyan de hatiye kirin. Ev jî ji derveyê holêrakirina bi hezaran pîrên dinî pê ve tiştek nîne...

Aşkera ye, gotinên wiha, diqeta mirov dikişînin û mirov didin pojînanandin, ji ber vê sebebê em difikirin wiha bêjin: ê baş e, dema Hexamênşîyan bi navê xizmatîyê li ser text û saltanata kelepore û serwetên netewî, dinî û rewşenbîrî yê Medîyan rûniştin, ji bo çi navê xwe lê nekirin? Vêca madem wiha ye, dibê ev serwetên han ji wan (Hexamênşîyan) ji Grekiyan re di ci de mabe! Wek em dizanin, Grekî di germiya hukumdariya Hexamênşîyan de êrişan ber bi Îranê û navçên Kurdîstanê de anîn.

Yan jî, di derheqê zîmanê kurdî yê îro û zîmanê Medîyan û yê Awesta de, eger yekê zîmanasê wek D. N. Mackenzie bi vê nêrinê re nebe, ku zîmanê kurdî yê îro jêmayî (nesil, kelepore) nû yê zîmanê Medî ye, gelege em lome li wî nekin, çûnkî wî ji bo vê nêrinê û lêkolîna xwe îstifade ji serokaniyên rojavayê, wek nimûne yê wan wek Tras Fars (?) û A. C. Arberg kiriyê ku piraniya bîr û baweriyên xwe li ser bîngeha hinek serokaniyên parîsî ava kirine û bi van bîr û bawerîyan hatine naskirin.

Ev nêrina Mackenzie û ya C. Arberg ku di derbarê zîmanê kurdî de nîn, bi lêkolîna zîmanasên wek Kant re li hev nakin û lêkolînerên dilsoz û jêhatî jî, ji ber vê sebebê, ji îmkana diyarkirina zanyariyên rast û durust mehrum dibin.

Aşkera ye em jî tê de, armanca hemû kurdekî dilsoz û xwendewar gelege ew be, ku bikare bi dilsozî lêgerin û lêkolînê di vî warî de bike. Ji ber vê jî hewce ye em karê xwe bi xwe bikin. Kesekî biyanî nikare di vê hervaza han de ber xwe bide û nikare dilsoz jî bibe.

Di her halûkarê de, bê li ser zêdekirin, gelê Arî di demên kevin ve li navçên Îranê û Kurdistanê îro de jiyane.

Zîmanê wan, di warê muqayese kirina navbera wan de, vê yekê têxin destê me, ku heta nêzîkî 500 sal berî zayînî, ji awayê lehça zîman pê ve, bi tu awayê (zîmanê rojhilata Îranê yê rojavayê Îranê- Kurdistan, zîmanê xwarê yê Îranê) şiklê zîmanekî serbixwe ya temam wernegirtiye.

Yanî, zîmanê Medî û ya Awestayî wek zîmanê dinî û ya parîsiya kevin û heta ya "persî" jî, heta demek dûr û dirêj, bi kêmasî nêzîkî çend sedsalê berî zayînî, wek xorca zîmanê Îranê ya wê wext û demê bûn.

Ew yeka ku gotinên wiha îspat bike ev e: fermanên hukumdarên û nivîsên kolandî yê wan hukumdarên Hexamênşîyan, ne bi lehça zîmanê rojhilat û ne jî bi lehça zîmanê rojava (di dawiyê de navê zîmanê pehlewiya rojhilat û pehlewiya rojava lê hat kirin) têkelîhev nekirine yan nehatiye wergerandin.

Ev jî me digihîne vê qeneetê ku hemû ew xelk, yanî xelkê navçên Îranê û Kurdistanê bi naveroکا wan nivîsan têgihîştine.

Her wiha zîmanê wan ê dinî ku zîmanê Awesta bûye, bi yê Hexamênşîyan re muqayese nehatiye kirin an nehatiye wergerandin ser zîmanê Hexamênşîyan, ev yeka han jî belgek din a xurtkirina vê gotinê ye.

Li gor eynî prensîbê, ku dinê Zerdûştî dinê

resmî ya gelê Persîyan bûye, bi tu awayî têkelîhev kirinek ji bo naveroکا zîmanê Awesta ji aliyê Persîyan de nehatiye kirin.

Ev bêşik û gumanî, vê yeka han bi me dide îspat kirin, ku ew zîmanên Îranê yê wan deman de, wek me got, di çarçova sînorê lehça yek ceherê de bûn, xelkê wê demê ya Îranê û Kurdistanê hemû bi başî û rewani xwe pê ve zeliqandine û bi hêsani yekûdu têgihîştine û mani'a zîmanê kevin a Îranî, bi taybetî ewên ku bi morfolojiyê re mijûl dibin, wek rastiyeke ev yek li ba wan ciyê xwe girtiye.

Gavên cihê yê herî girîng ên di navbera wan de hatibe dîtin, di çarçova awayê dengdanê ku hinek dengên aktîf tînan dawîya kelîman, pê ve neçûye derve û eger em bi vî awayî rastê gelege gotin û melzemê zîmanê biyanî bîn, ev yeka han jî bilî problema cînartîyê li gel netewên biyanî pê ve, ku carn û carnan; bi awayê lehça rojhilat û lehça xwarê ya rojava ketibe berçav şûn de, tişteke din berçav neketiye yan jî vê çarçovê derbaz nebûye.

Ez di wê baweriyê de nîm, bi vî awayî wekheviya navbera zîmanên rojhilat û rojavayê navçên xwarê Îranê, ji bo demek dûr û dirêj nekîfşkirî û valatîyê de maye û heta êrişên Yunaniyan hatin ser navçên Kurdistanê û Îranê û tê de cîbicî bûn û belavbûna desthilata hukumdariya xwe qahîm û geş kirin û pişt re ber bi vê cîbicîkirina desthilatdariya wan re zîmanê Îraniyan ber bi ferqîtiyê ve gav avêtin. Çûnkî dewr û rewşek taybetî ji bo van cure gavan amade bûn, her yek ji van sebeban heta dihat ber bi dîrketinê ve zêdetir gav diavêtin.

Îşgalkirina welatên Îranê û navçên Kurdistanê ji aliyê Îskender û Yunaniyan ve û cîbicîkirina hukumdariya Heleniyan, bû sebebê holêrabûna rewşenbîriya dinî û ber bi jêr de birin û qedexekirina hemû awayek rewşenbîriyên din, ku bihna Îraniyan; ji bo armanca, daxwaz û xeyala nû ve ajardan û geşkirinê jê hatibe û qazanca pêkanîna yekîtiyê û hevkarîya Îraniyan tê de be.

Ji ber vê sebebê, bi zorî yan bi hezî, bi xwestin an nexwestin, bi dehan gotinên Yunanî û yê Aramiyan hakimiyeta xwe ser zîmanê Îraniyan de tesis kirin, bi taybetî ew gotinên Yunaniyan ku peywendîya wan bi kargerî, karsazî û ayîniya Yunaniyan ve hebû, ev yeka han jî bilî cure gotinên zîmanên din ku peywendîya wan bi felsefê û felsefa dinî ve hebûn.

Çênebûna yekîtiya hukumdariya navçeyî ya Heleniyan li navçên Îranê û Kurdistanê de, ku ji ber sebebê cudaliya regez, neteweyê cur bi cur û zewaca hinek ji wan bi hinek Îraniyan re û mihêldariya van aîlan bi wan re, di milek din de regezperestiya hinekên din, di milek din jî ji holêrakirina sebebên serekî ku dibin sebên qahîm û zexim ji bo pêkanîna yekîtiya Îraniyan, bêguman bûn sebebê tesîsa hakimiyeta gotinên zîmanên cur bi cur û bi taybetî ya Yunaniyan (ku di muddetê 300 salan hê hinek zêdetir domand) bi ser zîmanê Îraniyan de tesîrek wisa kirin ku heta niha jî

şûnewarê tesîra wan maye.

Ew yeka ku diqet dikişîne ev e, ku ew awa desthilat û hukumdariya Helenîyan û karektera wan ên di dewrên cuda cuda li navçên cihê û cihê yên Êran û Kurdîstanê de, bûn sebebê wê ku heta derecek, cure guherandin û keyfiyeta girtinariya dinî bi awakî aşkera, nehênî û hetta hişyarbûna mirovayetiye ya xelkê din ên navçên rojhilata Êranê, ji yê xelkê navçên rojavayê Êranê û ji yê xelkê navçên xwarê Êranê, ber bi cihêbûnek his pê kirî û sînorek aşkera ve çû.

Hebûna desthilata Persîyan li navçên rojhilata Êranê di destpêka salên 250 yê pêş zayîni de, ku wî navê re piraniya rojava xarê Êranê destê Helenîyan de bû, peywendîya dijîtî û dijminatîya navbera wan de wek xwedîyê welat û dagirkerê welat, yanî wek îşgalkirî û îşgalker û dirêjkêşana dijminatîya xurt û bêtebat a navbera wan de, bû sebeb, yaxut handana ji bo dest pê ve girtin û bernedana hisa neteweyî û sebebê yek ji wan jî cêgîrbûna zimanê persî bû, ku wek zimanek serbixwe ya rojhilata Êranê, di nav çarçovek aşkera û ronî de bû.

Madem wiha ye, zimanê Persîyan a rojhilata Êranê li gor zimanê navçên rojava yên xarê Êranê paqîjtir maye, lê çi heye li hemberê wî de, zimanên navçên rojava yên xarê Êranê, bi dehan kelîme û gotinên grekî, aramî û asuriyan wergirtiye yan peywendîya wan gotinan bi wan zimanan re hebû.

Îspata wan gotinan jî tekstên "Manî" ne ku yê rojhilatê bi zimanê persî û li hemû cure "şerh û tefsîrê" dûr in, ev bi tevayî di eksê tekstên Şah Burqan in ku teji jî gotinên aramî û yên din in.

Ev cure gotinên cihê yê zimanê persî yê rojhilat, ji lehçên zimanê xarê û yê rojavayê Êranê, hetta bi awayê uslûba nivîsandina tekst û rênivîsê ve jî diyar bû.

Hêjayê gotinê ye, mayîna zimanê persî yê rojhilat di muddetê şeş sedsalek wek zimanê fermanrewayî ya Aşkaniyan, bû sebebê wê ku pêşde biçê, ber bi hêsaniyê ve gav bavêje û yek ji wan pêgavan jî ber bi neman û qutbûna dawîya nav, zamîr û sîfatên e ku her yek ji wan di heşt halletan de, kutayên (ekên) cur bi cur pê ve dihatin nivîsandin. Lê zimanê navçên rojava yên navçên xarê Êranê, ji ber peywendîya wan bi dehan kelîme û gotinên Asurî, Grekî, Kildanî, Babilî û Elamiyan re, zêdetir ber bi wendabûna wan kutayîyan ve çûn. Ji bo palpiştê ve gotinê jî, ji bilî ku ji persiya kevin û kurdiya kevin "Medî û Awestayî wek zimanê dinî" de, di dehan wan kelîme û gotinên cihê cihê de tê dîtin, di persî û kurdiya nû de jî heta niha şûnewarê wan gotinan mane.

Zimanê navçên rojavayê Êranê, ku wek zimanê Kurdî yê kevin (an zimanê Medî), ji nû ve ajar da û ber bi geşbûnê ve çû, bi vî awayî zimanê gelekî ji deynkirin û sitendina kelîme û gotinên biyanî xelas bû, ev di milek de û di milek din de jî zimanê dinî yê Kurdî; zimanê Awesta, ji nû de pêşde çû û xwendevanên dinî zêde bûn, ji ber vê sebebê, bi sedan kitêb li ber kitêbên din hatin nivîsandin. Ev yek sebebek gelek giring bû ku

parêzgeriya qebara zimanê dinî yê Kurdî Awesta û yê gelî bike.

Bingeh û himê zimanê Persî Sasanî, ku bi navê "Parsîk" nav daye, li ser zemînê zimanê "Persî Aşkan", Persiya kevin, zimanê Kurdî yê kevin (zimanê gelê Medîyan û zimanê wan ê dinî -zimanê Awesta) ve meşîya ye, xulaseyek ji gulbijêrên wan e. Ev di milek de, di milek din de jî zimanê navê wî derbaz bû, xwedî gotinên xwe yên taybetî ne ku yên din xwedî gotinên bi vî awayî nîn in.

Ev cure gotinên zimanê "Parsîk", bêguman hinek zimannasan ber bi şaşiyê de biriye û wan gîhandîye bir û baweriyek wisan ku zimanê kurdî lehçek zimanê "Parsîk" bihesibînin!!

Dema fermanrewatiya Sasanîyan de, teqrîben di destpêka damezrandina wan de, ji bo yekgirtina mîrîtiyên Êranê û vehûndandina yekîtiyek hê xurt û sitortir di navbera wan de, melheza berhevkinê Awesta kirine. Ji ber vê yekê bû ku ji aliyê Ardeşêr ve ferman ji "Pîrê Pîran Tanser" hat dan, ku karê berhevkirina Awesta bigre ser milê xwe.

Her bi çi hal û zehmetan jî be, Awesta hatiye berhev kirin, yanî saya Tanser û gelek pîr û zanayên dinî yên din ve, ji bo ji aliyê hemû kesan ve têgîhiştina wê hêsan be, ew qismên berhevkirî bi hev re muqayese kirine û notên (perawêzên) cure cure jê re nivîsandine.

Di vîr de, yanî vê merhelê de, cure bûyerek hatiye dîtin, ew jî ev e; ku zimanê Persî Sasanî gavek ber bi zimanek serbixwe ya xwedî gotinên diyar avêtiye ku wî jî zimanên din ên Êranê ve cihê dîke û ev jî sebebê serekiye ku zimanê Awesta ji aliyê hemû xelkên wê demê ya Êranê ve (mebest ji vê, xelkê navçên xarê ya rojhilata Êranê ye) nehatiye zanîn û "piraniya xelkê wê demê yê navçên rojavayê Êranê jî ku Kurdîstana îro ye, gelek kêmtêgîhiştiye".

Ji ber vê, "Zend", "Pazend" û "Awestayê Biçûk" wek ji bo şilovekirin, ronî kirin û zelalkirinê hatine holê.

Şilovekirina zimanê nav kitêba dinî ya Awesta di rîya "Zend", "Pazend" û "Awestayê Biçûk" ve, bi awakî ronî û bêşik, vê yeka han dide destê me ku:

- Zimanê kitêba Zerdest ku zimanê Awesta jê re tê gotin, wek zimanek dinî ji zimanê Parsîk serbixwe û cihê ye, yanî, wek zimanek serbixwe yê dinê tê hesêb kirin.

- Zimanê gelê navça rojavayê Êranê (Kurdîstan), wek zimanê navçê din ên Êranê, ber bi cihêbûnê de gav avêtiye ku bi zimanê Awesta re du lehçe zimanan zimanek pêk aniye û bingehê vê gotinê jî li ser vê hatiye danîn, ku îro bi dehan kelîmên zimanê kurdî li gel zimanê Awesta hevdeng û hevmana ne. Lê çi heye hevdengî û hevmanaya wan di nav zimanê Parsî ya îro de dest nakeve, ger hevdengîya wan dest bikeve, hevmanaya wan nayê dîtin û eger hevmanaya wan hebe hevdengîya wan nabe!!

- Peywendîya çêbûna "Zend" û "Pazend" a dema Sasanîyan de bi hev re nîn e.

Çunkî, "Zend" jî bo şilovekirina "Awesta"

hatiye çêkirin.

"Pazend" jî ji bo şilovekirina "Zend" hatiye çêkirin

Madem wiha ye, zimanê "Zend" jî aliyê Sasiyan de nehatiye "zanîn", eger wiha nebûya çi qazanc jî "Pazend" hebû.

- Li gor vê, jî me re ronî dibe ku zimanê "Zend" zimanek taybeti ye û hinek bîr û baweriyên wiha jî hene ku "Zend" zimanê navça Bextiyarî ye û Zerdeşt bi xwe jî ji bo ronîkirin û şilovekirina zimanê nav Awesta bi kar aniye!

Aşkera ye, piştî girtina gemê desthilatê jî aliyê Hexamenşiyân ve, wek ku hinek dibêjin; Medî jî binî de holê ranebûne û destgîrêdayî neman. Ji ber ku piraniya eşîretên bi hêz ên Mediyân xwediyê navçe û gundan bûn. Li wan navçe û ciyan de, hêzên xwe, jî hêzên xwe yê berî yê eşîratî û îmkanên xwe zêdetir dane hev, car û caran di çarçova sînorê navçên xwe de serbestî û azadiya xwe tesîs kirine, desthilat û sînorên xwe jî yê din cuda kirine. Bi navê serokê eşîretan an bi navê navçên xwe, nav û dengê wê desthilat û hukumdariya xwe di dîroka kevin de dane nivîsandin.

Mîsalek di vî warî de ku di dîrokê de bi awakî ronî û zelal li ser rûpelên dîrokê dane nivîsandin, Karduxî ne. Li navçên Botan ê îro de li ser neqş, neqaşî û kolandinên cîranên xwe de, navê wan xwedî desthilat û xwedî ax û av derbaz bûye.

Her wiha, Dewleta Nawdoaw (navbera du avan-Elişêr) ku di dîroka kevin a biyaniyan de

bi navê Ehdiyab, Ahdiyab, Axdiyaw an Axdiwaw derbaz bûye, mîsalek din a van belgan e. Ev dewleta han jî li navça herdu Zê de bûye, ku dikeve nav cergê Hewlêra îro.

Bi her halûkarê hebûna stirabnişînê wiha li navçên Kurdistanê yê cuda cuda de, hewildana wan jî bo sitendina azadî û serbestiyek bi temamî di navçên xwe de, şerê wan ê jî bo parastina desthilat û sînorê wê stirabnişînê û her yek jî wan bi navê serokeşîr an bi navê navçên xwe ve, bû sebebê parvebûnê yan peydabûna lehçên cur bi cur ê zimanê Medî (kurdiya kevin).

Di vir de bi taybetî jî bo behsa vê xalê, dibê em Prof. Roland û C. Kend bi bîr binin ku dema diyarkirina Parsa navîn de, wisa didin xuyakirin ku zimanê Parsa navîn sê beş in:

- Pehlewiya rojhilat
- Pehlewiya xarê
- Pehlewiya jorê rojava yê rojava.

Mexsed jî vê Pehlewiya rojava, ew zimanê Îrani ye ku di wê demê de li navçe Kurdistanê îro de belav bûye.

Her wiha, Prof. Kend, di warê morfoloji de dide xuya kirin, ku zimanê pehlewî yê rojava û zimanê Awesta jî hev re nêziktir in, heta nêziktirê her cure zimanek din ê Îranê jî zimanê Awesta û zimanê Medî re.

Dûmahîk heya

Danezanek

Wek ku xwendavanên Berbangê pê dizanin, piştî kongreya Federasyonê ya dawî, redaksiyoneke nû hat damezrandin. Min bi daxwaza xwe, nexwest ku di redaksiyona nû de cîh bigirim. Redaksiyon hat guhartin û hinek endamên nû hatin nav redaksiyonê. Ew bi xêr û xweşî hatin!

Ji wan endamên nû, Mustafa Aydoğan, di hejmara 81'ê de, bi navê "Lêkolînên li ser ziman ihtîmamek mezin dixwazin" nivîsarek nivîsand. M. Aydoğan di vê nivîsara xwe de rexne li nivîsara min a ku di hejmara Berbangê ya 79-80'î de bi navê "Têkiliyên kurdî û swêdî" hati bû nivîsandin digire. Weha dîyar e, ku wî xwe jî bo rexne girtinê gelek eşandî ye. Li gelek ferhengan mêze kiriyê. Rast e, di nivîsare min de, gelek çewtiyên swêdî hene. Wek M. Aydoğan jî destnîşan dike, giranî çewtî û kêmasiyên tîpan in. Lê, ez dixwazim çîroka vê nivîsar xwe binivîsinim, ku xwendevan bi rastiyê bizanibin. Min wê nivîsara xwe jî bo çapê, berî saleke bi awayeke rastkirî dabû Kirîv.

Hem jî bi şemaya dara zimên ve... Nivîsar li ba Kirîv wenda bû. Em gelek lêgeriyan, teksta wê di kompîtura Federasyonê de jî tune bû. Piştî çend mehên, dema ku kongre çêbû û redaksiyon hat guhartin, rojekê ez çûm Federasyonê û bi kompîturê ve mijûl bûm, min dît û bi eynî navê ew nivîsar di kompîturê de heye. Min bi destê xwe, wê derxist û da endamên redaksiyonê M. Aydoğan û Cemal Batum. Leza redaksiyonê hebû û heta şemaya dara ziman jî nedît. Paşê Cemal Batum got ku "Kirîv şema dara ziman wenda kiriye, lê, ez wê li cihê din peyda bikim." Weha jî bû.

Dema nivîsar di Berbangê de derket, bi rastî min lê nêrî, ku di swêdiya wê de çewtiyên tîpan pir in. Dîyar bû, ku ew teksta ku me piştî salekê di kompîtura Federasyonê dît û da çapê, ne ye ku hevalên Swêdî û Kurd lînerî rast kiribû, bûye. Ew ya musfede bûye.

Ji derê çewtnivîsandina tîpan, Mustafa hinek tiştên din jî dibêje, li gor min ev ne rast in. Ji xwe nivîsar bi

armançê din hatiye nivîsandin. Hejger armanca Mustafa tiştêkê din nebûya, dê wî bala xwe bidan nivîsara xwe ya "Komeleyên me" ku di hejmara 81 rûpela 12-an de hatiye nivîsandin. Ji ber ku ew darsa ziman û gramerî bide, bila ji kerema xwe re 10 deqîqeyên xwe bidan vê nivîsara xwe ya han û carekê din wê bixwendan. Ez bawer im, ku dê wê demê, wî di yek rûpelekê de 53 çewtî û şaşiyên daktîlo û rêzimanî nekira. Dîyar e, ku Mustafa jî ber mêze-kirina ferhengan wext nedîtiye, ku carekê din wê nivîsara xwe ya han bixwîne. Çewtî û kêmasiyên wê rast bike.

Bi înkarkirina zebat û fedakariyên kesên berî xwe, mafê tû kesî tune ye, ku xwe navdar û zana nîşan bide. Fermo tu û redaksiyon.

Ji hemû endamên redaksiyonê re serkeftin dixwazim. Mustafa û endamên nû jî, bi xêr û xweşî hatin nav refên redaksiyonê.

Ahmed Tigrîs

KURD HEWCEYÎ CÎNS Û BALAFIROKÊN ŞER IN

Ew pantolonên cîns ên navdar ku Kurdên Iraqê re bêî nîşana Lewis ji bo ku li xwe bikin ji Swêdê hatin rêkirin. Her çê be jî, di wan demê bihûrî de ji bo Kurdan bilî kinçekî bi ser xwe de bikin gelek pirsên girîng ên din hebûn.

Hîç ne be, demî be jî diktatorê Iraqê Saddam Hussên serê xwe li ber şertên Komisyona Ewleyî a Yekîtîya Koma Miletan danî û silahên (çekên) xwe ên gelêrkuji xurde kirin.

Bêguman wî ew tiştana bê dilê xwe dikirin.

Lê, bêşik wî baş famkiri bû ku ewê welatên hevgirtî amadebûn ku bi şer wan çekên bisaw û xeter ji destê wî bistîn in. Ew bixwe bû na jî bêkêmanî wî ji ew tişt bikirana.

Lê çî mixabin ku, divêt vî mirovê zordar û bê vijdan tencedigihîşt ewê ji bo çê welatên rojava xwedî li Kurdan derketin. Ew berjewendiyên hêzên politîk bi van berlêgirtinan ne ewqas eşkere bûn. Tehlûke û pirsgrêk pirin û dijwanin.

Di destpêkê de Saddam Hussên misoger bû ku ewê dewletên rojava ji bo kurdan qet tu tiştêkî ne kin. Ew pêti dana bi lez a di ragihandina giştî ku di televizyonê de li ser belangazî û azar kişandina Kurdan bû ku sedema welatên rojava mecbûr kirin mudahaleyê vê pirsê bibin. Têgîştina ragihandina giştî bi pêl bûn, bi taybetî ew trajediya bi dilşewat ku di çerçewa televizyonê de tesîrek gelek girîng peyda kir.

Sereskerên iraqî dikrîbûn serokên xwe ê gewre li ser pirsê dijwariyên welatên hevgirtî a di parastina kurdan de agahdar bikirana. Heke Saddam Hussên êrîşî herêma azad a li Kurdistanê bike ewê balafirokên amerîkî, fransî û inglîzî dikarin êrîşî eskerê iraqê bikin. Berku balafirokên welatên hevgirtî di balafirgehên Tirkîyê de radiwestin. Hikûmeta Iraqê ne di wê baweriyê de bû ku ewê hikûmeta Tirkîyê rê bide balafirokên welatên hevgirtî di balafir-

gehên Tirkîyê êrîşî Iraqê bikin. Ji berku ewê li Tirkîyê jî pirsê Kurd dijwar bibe.

Ji bo mirovekî wek Saddam pîrr bi mantiqî bû ku ewê ji xwe û xwe bipirse; ewê rastî ji welatên rojava ji bo xatirê Kurdan ji nû ve amadene ku bi balafirokên xwe Iraqê bombebaran bikin. Ji ber vê ewê bi taktîkên veşartî kurdan bi pesîn e û ji bo welatên hevgirtî jî diwarê yekîtîyê de dijwariyan bîne holê ku ew êrîşî Iraqê ne kin. Û wexta welatên hevgirtî ne xwastin bi êrîşek tûnd biçin ser leşkerê iraqê, ew jî daxûyakin ku welatên hevgirtî jî ne dixwastin ku guhartinek siyâsî di nav Iraqê de peyda bibe. Di hundir salekê de Saddam zilm û zordariya xwe li ser kurdan qewim kir û wan bipesîn e.

Pêştî vê payîzê hêzên eskerî ên Iraqê rê ne dan ku alikariya hewceyî ji Iraqê derbazî herêma azadî li Kurdistanê be. Niha di dest kurdan de ji bo wergirtina alikariya hewceyî du rêyên gelek bi zehmet ma ye. Ev herdu rêyana jî di ser sînorê Tirkîyê an jî li ser sînorê Iranê re derbaz dibin û ev herdu rêyana jî li gor daxwaziya dewleta Tirkîyê û Iranê dikare di carekê de bête girtin. Hikûmeta Baxdayê hewil dide ku gelê Kurd bitirsîn e û ew alikariya ji derva tê bigre bin destê xwe. Hikûmeta Baxdayê bi listikên veşartî di ragihandîna xwe de; "bi bawerî bûna alikariya ji destê dewletên biyanî" ji xwe re qira bi gazan jahr û kuştin anî ye.

Di van demên bihûrî de hikûmeta Baxdayê metodên diha dijwar standin. Hêzên eskeriyê ên giran di sînorê Kurdistanê de bi cih kirin. Bi topên dûravêj bûn sedemê cîhbûna 40.000 mirovên Kurd. Û niha Saddam biryar da ku ewê xwe bicêrîbin e di şerê-sar de ewê çiqas li hember welatên hevgirtî raweste. Dewleta Iraqê daxwaz kirin ku bila balafirokên lêgerînê ên welatên hevgirtî li ser axa Iraqê ne firin. Baxdad bervê-

derî dike ku ew balafirokên lêgerînê dikare bibe "sebêbê bêsansîyê". Ji bo vê yekê Iraq dixwaze bide zanîn ku topên dûravêj ên li dijî balafirokan di sînorê Kurdistanê de cihwar kirin e û gelek caran jî ew balafirokên welatên hevgirtî jî girtin hedefê.

Heke welatên hevgirtî guhnedana vê hilana (tehdid) Saddam Hussên, wî bixwe biryara xwe da bû. Welatên rojava di vî warî de di ragihandinên xwe de propaxanda xwe dikirin û Saddam jî bi listikên veşartî zordariya xwe didomîn e.

Lê qet hîç ne be jî, welatên hevgirtî ew hilandana Saddam Hussên bi gotina be jî wergitin. Di van demên dawî de Yekîtîya Dewletên Amerîkayê, Brîtanya Gewre û Fransayê balkêşiyek dan hikûmeta Iraqê. Heke hikûmeta Iraqê bi tehdîdên vî cûreyê dom bike, "ew kirinana dikare bibe sedemê şerên eskerî".

Bi van hilandina û tehdîdên tûnd bes na yê wê manê ku Kurd di nav aramiyê da ne û hewceya wan tenê bi xwarin û kincan e. Bi daxwazkirina vekîşandina hêzên eskerî ên welatên hevgirtî, ewê Saddam Hussên bi taktîkên veşartî berxwedana dijberên xwe biwestin e û caverêyên rojên bikesy e.

Ew gelek baş e ku ji her aliyê Cîhanê de ji bo Kurdan alîkarî tê. Pantolên cînsbê nîşan- jî bi xêr bûn.

Di encama paşin de hebûn û parasitna wan (kurdan) bi alîkarî û qewla ku welatên Rojava dane ve giridayî ye.

Hans Henrik Rönnow
Ji Rojnama swêdî ya
Dagens Nyheter 16.04.1992
Swêd

Wergêr: Şoreş Zîrek

KLÊOPATRE

Klêopatre melika Misirê bû. Jiyna xwe di evîn û hezkirinê de derbas kiri bû. Beriya wê Zilêxa hebû. Zilêxayê jê hez dikir: hezkirineke kûr û hûr. Ji Zilêxayê ve mihbeta dilan yek bû, ne dibû dido. Dilê Zilêxayê bi Ûsif pêxember keti bû. Zilêxayê ew çend jê hez dikir ko rojekê gava pêş Ûsif ve sêv dixwarin kêr da bû destên xwe.

Klêopatrayê gelek caran û ji gelek kesan hez dikir. Lê evînên wê gelek ne tajotin. Şevêkê, kêman caran heta bi salekê. Lê bi Antonyo re Klêopatrê sebrî bi xwe da û di evîna wi de ji salê wê ve ji çû.

Belê melika bedewe carina şevêkê, şeveke kin, sêvêkê hez dikir.

Klêopatrê di kelkela Havînê de roja xwe di qesira xwe a penceregirtî de derbas dikir û ber bi êvarê, bi cêrî û berdevkên xwe ve derdiket bexêçeyên xwe ên bermil û temaşa hespên avê dikir.

Hespên avê bi xwe, ji germê pelixî, cangiran û linqerimî derdiketin qeraxan û devên xwe ên tîrehmezin bi ve kêsan vedikirin û di dora mehinan de bi lavekariya evînê digeriyan; bi pozên xwe ên hesitîfepêhin piştî mehinên xwe dixurand û talastin; ew kêfxweş dikirin û bi şahike şehwetengiz digel wan dadiketin avê; tê de winda dibûn. Piştî bihinekê, di wî milê avê de du sehvirên reş û lihevbadayî xuya dikirin.

Klêopatre, ra û damarên canê wê ji vê temaşayê şidandî û vegirtî, di ber xulamkoleyên xwe re derbas dibû, diçû qesira xwe.

Carina çavên wê bi xulamkolekî rift û lewend diketin. Wê şevê, ew xulamkole diçû xizmeta xanima xwe; piştî wê dida erdê, berê vê dida Xwedê û canê xanima xwe ê hişkbiyî, heta ko ew sist û nerm dikir difirkand û ew bedena zivîn, di nav cihan de, bi milên xwe ên zexm badida û distrand. Bi vê firikandinê badanê qey hestiyên melê dihelîyan û canê wê ê nerm dibû gutlek hevîr; hevîrekî hinde çir ko deng jê dihat. Klêopatre kêfxweş, ewçend xwêh dida û germ dibû ko dilmest û bêhiş di xew re diçû; germiya Havînê di germiya canê wê de winda dibû.

Sibetir ev xulamkole peyda ne dibû. Xelkê serayê ji hev lê dipirsin. Di-

gotin, bi wexîfekê çûye beriyê. Lê carina cêriyên xewgeha Klêopatrê di sêlûna hemama melikê de çend dilop xwîn didîtin bi tir, kerr û lal li wan difedkirin û xulamkole nema ji beriyê vedigeriya.

Rojekê, Klêopatrê, di diwanxana xwe a mezin û zêrhelî de xwe li ser textê xwe dirêj kiri bû û ji hêsbriyê li dora xwe difedkirî û wek masiyê ko ketiyê bejê bê kês û fesal xwe tev dida. Sidonye, cêriya wê a azadkirî, li ber lingên wê rûniştî, guhdariya emrên wê dikirin.

Klêopatrê bajena xwe bi xurtî hejand û ber bi jor rakir. Cêrî û koleyên ko li pêş wê ve qor girtî bûn, mana îşaretê seh kirin, xwe xwar kirin erdê, raxer maç kirin û di piştî perde û stûnan re winda bûn. Klêopatrê gote Sidonyê:

-Ya Sidonye, tu nizanî çi qas bihina min teng dibe. Dîtirsim ko sira ko di dilê xwe de vedîşêrim bi hilavêtina dilê min we singa mi der bike û wê bikeve ber çavên dinya û alemê...

Sidonyayê pêyên xatûna xwe rami-sand rûyê xwe di ejnûyên wê da û got:

-Xanima min! tu destûra cêriya xwe didi ko biştxilê û li dermanê xanima xwe bigere. Carina giyakî adetî dermanê derdekî zexm e. Ma ew çi sira ko xanim min têşîne?..

Klêopatre: Tu qene dizanî Sidonye ko ez gelek hejî te dikim û dilê min her bi te ve ye. Ev du sal in min tu ji cêritiyê azad kirî û min tu, di vê qesirê de, kirî miroveke aza û serbest; ji her mirovên aza azatir û serbestir. Û dîsan mi destûra te da ko tu li gora kêfa xwe ji xwe re li mêrekî bigerî da ko ez wî ji te re binim. Te ji xwe re evdekê reşik bijart. Min ew ji azad kir. Çire, ji ber ko hej te dikim.

Sidonye: Belê ezgorî, ez pê dizanim û dixwazim sezayê wê hezkirinê bibin. Û min Hamo, evdê reşik ji xwe re neqand...

Klêopatre: Belê Hamo, ev evdê reşik, jina mîrekî Hebeşistanê ew ji min re diyarî rêkirî bû. Hamo di deryavaniyê de şehraza derket û li Skenderiyê di cenkeştîyan de dixebite. Lê Hamo êdî ne kole ye, mêrekî aza ye û yê te ye. Çawan Sidonye tu bexitiyar î?

Sidonye: Belê ez gorî ez bexitiyar im, lê bexitiyariya min bi tenê hingê

tekûz dibe, gava min xatûna xwe jî bex-tiyar dît...

Klêopartê destekî xwe danî ser ser-rê Didonyayê û ne hişt ko gotina xwe bibe serî. Sidonye lê fedkirî. Du hêstirên germ û girover wek dudaneyên mirariyan di ser hinarikên Klêopatrê re ketin koşa Sidonyayê.

Sidonyê rahişte her du lingên xatûna xwe û ew li ser hev çend caran maç kirin. Sidonyê gote xatûna xwe: Ez gorî, ka bêje min çi dest daye te... singa min tirba sir û dildiziya te ye.

Klêopatre: Ma ew xortê ha, ew fermandarê romanî; yê ko heta bi Skenderiyê ez pê re rawestiyam naye bîra te. Belê ew fermandarê romanî, yê ko daye pêşiya ordiwa xwe û xwe li wela-tên Mad û Faris girtiye...

Sidonye: Mark Antonyo, ma ne ew e. Çawan nayete bîra min. Ew mirovê bextiyar. Belê bextiyar; lê ne ji ber ko serdarekî romanî ye; lê ji ber ko dilê melika Misirê meyildariya wî kiriye û îro melike riya wî dipê.

Klêopatre: Belê Sidonye, we ye, herwekî te gotiye; lê vegera wî bi dengî ket. Antonyo soza xwe da min, ewê jina xwe a romanî berde û li şûna wê ezê bibim jina wî. Emê herdu li ser textekî rûnin. Serên me di bin tacekê re wê bigehin hev; rohelat û roava her du welat ji ewê bindestiya me bikin.

Sidonye: Min hêvî ji Xwedê heye ko daxwazên xatûna min tev de biçin serî.

Klêopatre: Tu çiqas delal î. Sidonye, Xwedê ji te bibihîse. Kes nizane, dinya ye, te dît tifaqek lê qewimî... Way li min ax, ezê... ma ezê çi bikim; ma bêî wê ez dikarim. De rabe em jê re diayê bikin, ji Xwedê hêvîdar bibin...

Klêopatre û Sidonye deverû li erdê dirêj dibin. Di skûna şevê de dengê van her du jinikan wek zarina şirmjekî geh bilind û geh nizim dibe. Heye ko Xwedê ew deng bihistî bin.

Antonyo mizfer, serdest, bi mal û menal, bi hêsir û zulam ji seferê vedigere; terka jina xwe a ronai Oktavyayê dide û li şûna wê Klêopatrê mehir dike. Lê Antonyo newêre vî îşî di nav qewm û milletê xwe de îlan bike. Ditirse ko xelkê wî lê rabin, jê bigerin û bibin

dijminên wî.

Lê Antonyo pêşkepikî xurt heye: Oktavyo. Oktavyo birayê Oktavyayê, yanî bûrayê Antonyo ye. Oktavyo ji alîkî li heyfa xweha xwe digere û ji aliyê din dixwaze di Romayê de fermandarê tekane bimîne Antonyo bi nav û deng û bi mêraniya xwe di ser wî re ye. Oktavyo teqsîr nake û di şehnedêrekê de ji xelkê Romanyê re dide zanîn ko Antonyo jina xwe û romanî berdaye û melika Misirê. Klêopatre xistiye şûna wê.

Ji milê din Klêopatrê bi xwe zor dida Antonyo û dixwest ko ziwaca wan bête îlan kirin. Di ber çavên reiyetên Klêopatrê ev zawac ji melikê re rûmeteke mezin bû.

Antonyo, wî aşîqê şeyda nema kari bû li ber israra Klêopatrayê bisekine. Di sala 36-an beriya miladê, Antonyo bi name û qasidan ji rohelê heta roavê da zanin ko jina xwe a romanî berdaye; bûye mêrê melika Misirê û Klêopatre ketiye şûna Oklavyayê.

Meclîsa Romayê giha hev; romanîyan bi yekdengiyê Antonyo xain îlan kirin û ji Oktavyo re swinda sedaqetê xwarin.

Çar sal ketin navê, beriya miladê bi 32 salan; bû şer. Eskerên Oktavyo û yên Antonyo li hev dixistin. Klêopatrê daweta cêriya xwe a zadkirî şehinel dikir. Ji wê dawetê re torinên dewletên dost, giregirên welêt tev de hati bûn vexwendin. Klêopatre mêrê cêriya xwe Hamo, ew Hamoyê ko melikê ew azad kiri bû û xistî bû rêza torinan, ji xelkê re dida nas kirin.

Ji milê din Antonyo ji rabû, ji bo kêfxweşiya Klêopatrayê Hamoyê reşik kire naxudayê (1) cenkeşlike romanî, cenkeştiya ko Antonyo bi xwe tê de hatî bû Misirê.

Herçî cejin û şahinetên serayê hebûn, Hamo di hemiyar de hazir dibû û Klêopatre bêî Sidonyayê ne diçû tu seyranan û cêriya azadkirî hergav li ber textê melikê xuya dikir.

Sidonye jinikeke şaheraza û xudan vên û mekir bû. Klêopatrê gelek caran pirsra xwe pê dixist, pê dişewirî û ji ya wê dikir.

Rojekê Klêopatrê axin û keserek li xwe anî û gote Sidonyayê:

-Sidonye, dihi ez û Oktavyo em di

bexçê qesirê de digeriyan. Oktavyo ez kişandim ber siha darekê û ez li rex xwe rûniştandim. Oktavyo mideki xwe ker kir qet xeber ne da. Bi tenê bi awirine kûr, lê bişivîşk li min dinihêrî. Ez rind pê dihesiyam ko di xeyalxana wî re tiştine hewilnak derbas dibûn û wan ew têşand. Min xwe nema ragirt û jê pirsî. Ewî ji her tişt gote min. Belê Antonyo ditirse ko demek wê hebe, ez ji wî û evina wî aciz bibim û ezê dil bikim ko jê xelas bibim. Hingê ezê hejrê bidim ê. tu dizanî Sidonye dijminên me zehf in, li ber fikan sekinîne û li firsendekê digerin; da ko bavêjin nav min û wî. Ditirsim ko lingine rêvin pê li kaniya evina me a zelal bikin û wê ava zelal bişeyloyinin û me tê de bixeniqînin.

Sidonye: Ez gorî, heq di destê te de ye. Lê nabe ko tu newmid bibî û xwe hê tevdîr bavêjî himbêza qedere. Roma yên ko xiyanet û bêbextî lê kirinê, wan pê ceza nahilê; zû an dereng cezayê wan dide. Antonyo bêbextî.

Romayê kiriye. Lê qedera te bi qedera wî ve girêdayî ye. Divêt tu evina xwe di singa wî de bi xwedî bikî û divêt ewlehiya Antonyo bêxî destê xwe.

Klêopatre: Belê, lê çawan û biçî awayî. Ji hinî ve ez bala xwe didim û tête bira min ko midetek e Antonyo destê xwe nade tu firaxên xwarinê yên ko min jê ne xwarine û piyana ko min jê venexxwariye nake devê xwe. Jê dixuye ko di her tiştî de jehrê dibîne.

Sidonye: Sibe ezê ji te re rêke welê şanî bikim ko mêrê te ê romanî wê bizane ko jinika ehmeqtir dikare mêrê jîrtir bixapîne.

Weke hero, Antonyo û Klêopatre, berî ber bi behirê, di şehnişîna qesirê de rûniştî, şiva xwe dixwarin. Klêopatre ji her firaxê parik dibir û piştê ew dida mêrê xwe. Piştî ko xwarin û vexwarin; ketin himbêza hev û xwe li ser textekî dirêj kirin. Klêopatre li bêjnina mêrê xwe a zirav wek dargerîngeke ter aliya bû û ew li singa xwe dişidand û rûyê wî bi şopa maçikan sor dikir.

Her du ji serxweş bû bûn. Piyânê şera bê, li ser hev, bi ser xwe ve dikirin, Klêopatre rahişte piyaneke mezin û ew heta bi nivî vexwar. Gava nivê din dida Antonyo, serê xwe hinek hejand û pelek ji gula ko bi pora wê ve bû ket nav piyana şerabê. Antonyo ev piyan ji wek piyanên din bire ber devê xwe. Klêopa-

trê destê wî girt û bi tirs û lertz da ber qiran û got: "Vê şerabê vemexwe". Rû û eniya Antonyo têk ve çûn. Antonyo bi tirs û ezeb li Klêopatré dinihêrî. Klêopatré banî Sidonyê kir û piyan da ê. Sidonyê koleyek anî û piyan da destêwî. Bi emrê Klêopatré kole şeraba piyanê vexwar û piştî çend deqîqan mir.

Klêopatré milên xwe ên zivin li stoyê Antonyo gerand û got: "Hey serserem, tu dibinî, min dilê xwe li te xerab bikira, min dikarî bû bi pelê gula serê xwe jehirê bi te dim û te bikujim".

Antonyo deng ne kir lê qenc zanî ko pelê gula serê Klêopatré jehirdar bû û heke Klêopatré bixwesta bi çi awayî hebe karî bû jehirê bidiyê.

Jin û mêr xwe bi tenê kirin, çira vemirandin û ketin himbêza hev. Bi tenê heyveke çardeşevî wek rûyê mirovekî li xwe heyirî dinav perdeyên qesirê re li wan temaşa dikir.

Şer dom dikir. Eskerên Oktavyo û yênan Antonyo di bej û behiran de li hev dixistin.

Didowê Îlonê 31 sal beriya miladê.

Kenkeştîyên Oktavyo û yênan Antonyo û Klêopatré di behira yewnanistanê, di Ekzyomê de gihane hev û li hev dan. Ji nişkekê ve kenkeştîyên misrî bi şûn de vegeyriyan. Stola Oktavyo da pey. Yênan Antonyo direvin. Di wê rojê de xuya kir ko Oktavyo wê zora Antonyo bibe û kişwerên rohelê û roavê bêxe destên xwe.

Herçî Klêopatré, di nav bîst û çar saetan de bîst û çar çaran li mêr û yarê xwe diqelipî ew dixist xeydê, ji xeydê, ji xeydê radikir û ew tavête dexsê; ew li ber lingên xwe digerland û ew di taya evinê de sermest û bêhiş dikir.

Ma dîsan ne ev Klêopatré yewnanî bê ko qeyserê Romayê Jûlyus Sêzarûs xistî ba dava evîna xwe û paşê li qulipî û bêbextî li kiri bû.

Niho dora Antonyo bû. Antonyo ji kelî bêtora yewnanîyê û îro dibû qurbana xiyaneta wê, Niho Klêopatré Oktavyo da bû ber çavên xwe, bûra û neyarê mêrê xwe. Oktavyoyê ko zora Antonyo dibir. Evîn û zeferdariya Antonyo kevin bû bû; wek diwarên qesirêke zêrbelî yênan ko zêrên xwe diweşîne erdê ew di bin lingan de dibin ax û xwelî.

Jê re mîzeferekî nû û agirekî sor û bê xwelî diviya bû. Ew mîzefer ji oktavyo bi xwe bû. Oktavyo Misir û kişwerê wê dê bîstanda û wî ew bidana ser imperatirîya Romayê. Klêopatré wê bibi wa melika Romayê ji.

Antonyo bêbextiya Klêopatrayê bîr dibir lê berbirîneke bi derengî; tîr ji kevanê filitî bû.

Ev bûbû salek ko cenkeştîyên Klêopatrayê de Eksiyomê de şekistî bûn û ji ber stolan Oktavyo baz da bûn.

Yekê Tebaxê, sîn salî beriya miladê.

Eskerên Oktavyo guhaştî bûn deriyên Îskenderiyê û li eskerên Antonyo digeriyan.

Ev şerê dawîn bû, Heke Antonyo digeriyan.

Ev şerê dawîn bû. Heke Antonyo nikariya eskerên Oktavyo bişkenîne û ordiwa wî bi şûn de vegeyriyan Oktavyo wê biketa payitexta Misirê û heta tîrbên firewnan jî jê re bijin û sto wê xwar bikirana. Berî herkesî melika Misirê Klêopatré.

Klêopatré ditirsî; ma Antonyo bi bêbextiya wê ne hesiya bû. Klêopatré xwe di hewranîkî reş pêça û ji deriki qesirê li nizim derket û gote Sidonayê:

-Min ji te pêve tukes navê.

Sidonayê: Ma Hamo?..

Klêopatré: Hamo... belê, bila ew ji bi me re bêt. Sidonye min bibe û min di nav tartîtiya tîrbên qral û imperatoran de veşêre. (berê xwe da Hamo) Te emrên min bi temamî bi cih anîne?

Hamo: Belê ezbenî, ne kumandaren eskerên bejî, ne jî yênan behirê ji ya Antonyo nakin, kes det nabe xwe...

Klêopatré: Sidonye, Hamo! min sehiw girtiye, ez ditirsim. Belê ez ditirsim ko Antonyo bide pey min û min bigehine cezayê ko awazayî wî me.

Klêopatré şeva xwe di nav tîrbên hikimdarê Misirê de derbas kir. Leşker û stola stavoyê zor dida deriyên Skenderiyê.

Mark Antonyo li Klêopatré digeriya; lê ew peyda ne dikir. Antonyo didît ko her tişt wînda bûye. Antonyo şûrê xwe kişand û ew di qelbê xwe di wî qelbî re ko hêj evîna Klêopatré de xwe tev dida derbas kir û ew fer-

mandarê navdar bê nav û deng, bê şan û rûmet mir.

Oktavyoyê mîzefer ket Skenderiyê û emir da ko melika Misirê a bedew, wê melika de qeyser û fermandarên Romayê tac, şûr û bi kezîyan bi ereba wî ve girê bidin û di kûçeyên Skenderiyê de rakişinin.

Klêopatré ev bihîst û zanî ko bi-maya, bi emê bivî awayî wê bigihaşt Oktavyo.

Esker û berdevkên Oktavyo ketin kûçe û kolonên bajêr û melikê geriyan. Lê li şûna Klêopatré zindî, cendekê wê peyda kirin.

Hamo, jê re marçî reş di dirêj peyda kiri bû. Klêopatré deverû xwe li erdê dirêj kir û mar berda ser xwe. Mar ji wek aşiqên wê di dora wê de geriya, canê wê ê tenik çend çaran bibin kir, di bin berzika wê re xweşiya, li navtanga wê aliya û xwe gihand para melikê û jê daket bin erzina wê, sing û berê wê tev da, gerdena wêkire devê xwe, ew bedana narîn û nazenin carekê, ducaran li çermê xwe ê reş şidand.

Klêopatré heta hingê xwe tev ne da bû. Gava bi germiya devê mar hesiya bi carkê de xwe bilavêt. Bi wê tevdanê di bin melikê de cih li mar teng bû. Mar bi gerdena melikê pihêt girt û bi zengelora wê veda.

Klêopatré ko di himbêza aşiqên rift û lewend de bi xwedî bû bû û kumê gelek camêran xistî bû balgihê xwe, bi maçîka marekî reş î sik, bê xwedî û xudan mir.

Herçî Hamo û Sidonye, kelaşên van her du xadimên sadiq û wefakar li ber cendekê xatûna xwe nobet digirtin.

Bişarê Segman

Dihok:12 Tebax 1942

Hawar hejmar 50

Çiriya Pêşîn 1942

(1)Naxuda: Kumandarê vaporê; keptan.

«ENDAMÊN KOMELA DEMOQRAT A JINÊN KURD DI DIBIDSTANA GEL A BILIND DE QURSÊN CÛDA DÎTIN»

Qursên cûre-cûre ku me ji bo endamên komela xwe li dibistana Gel a Bilind a Biskops Arnö amade kir, eleqederiyeke fireh dît. Di wan du rojên qursên întensîv de qasî jinan zarok ji beşdar bûbûn. Dibistanê ji zarokên me re ciyê hêlinê ji nişandan ku ev ji faktoreke girîng bû, ji bo em fersanda axaftinê bibînin. Me qursa xwe ya ewilîn di sala 1990-î de pêkanî, 20 kes beşdarî

wê qursê bûbûn û di qursê de xebatên komelê û pêşneyarên ji bo pêşerojê hat minaqeşekirin.

Babetên qursên me yên ku me di payîza 1991 û di bihara 1992-an (3-4-5-ê Nîsanê) de amade kir.

"Jin û jiyana wê û dîroka tekoşîna Jinan" bûn. Di wan qursan de ji bo xebatên me yên hîndekariyê baş bime-

şe çî ji destê mamosta ya Dibistanê Biritt-Mari hat kir. Me alîkaiya "Rektora Dibistanê" Birgitta Östlund ji dît.

Di wan rojan de, me fersenda axaftina gelek, babetan dît ku di wextên normal ên bi sînora de, û di rewşekî stres de em nikaribûn wan pirsan zêde bipeyîvin.



"AGAHDARÎ JI BO JINÊN KURD"

JI KOMELA DEMOQRAT A JINÊN KURD

-Tu nû hatî Swêd û dixwazî bi jinên Kurd ên din re binasî.

-Tu hewcedarê alîkariyê ye, dema ku bi meqamên resmî re têkilî dayni.

-Di kar û barên xwe yên bi lêz de, tu dixwazî zarokên xwe daynî derekê.

-Tu dixwazî di qursên me yên saz, govend (Folklor), ziman û hwd. de ku komela me amade dike, beşdar bibî.

-Tu dixwazî ji bo pirsên jinan tu dikarî ji komelê alîkarî bigre.

Li me bigere!

Were Komela xwe!

Em digel hev xurt in!

Telefona Komela Demoqrata Jinên Kurd:

08- 653 21 15

Dema telefonkirin:

Duşem - Şembî navbêra

Saet: 10.00 - 16.00

Yekşemê Saet: 13.00 - 18.00

Rojên Îniyan Komele girtiye.

Cihê Komelê: Kungsgatan 80, BV
T.Bana Rådhuset.

Derketin ji aliyê Kungsholmsg

Dema vekirina komelê:

Duşem - Şembî saet:10.00 - 16.00

Yekşem Saet: 13.00 - 18.00

Navnîşana Postê:

Box: 4033

163 04 Spånga/ SWEDEN

PARLAMENTO YA NETEWYÎ YA KURDISTANÊ CIVIYA

Civîna yekem ya Parlamentoya Neteweyî ya Kurdistanê di 04.06.1992-an de saet 10.35-an de li bajarê Hewlêrê civiya. Civîn di bin serokatiya muwaqet ya Hesên Kanbî Bilbaz de ku endamê herî bi emir ya parlamentoyê bû, vebû.

Endamên hilbijartî ya Parlamentoyê yek bi yek hatin kursiyê, sonda endametiya xwendin. Sonda endametiya Parlamentoya Neteweyî ya Kurdistanê wisa hatibû tesbîtkirin.

"Bi navê xwedayê mezin sond dixwûm ku yekitiya erdê Kurdistanê

Iraq û berjewendiyên bilind ya gelê Kurdistanê biparêzim."

Piştî sondxwarinê, serokê muwaqet ya parlamentoyê derbasî hilbijartinê serok û cigirê serok ya parlamentoyê bû. Bi dengên tevayî, Cewher Namiq Salim (PDK-I) ji bo serokatiya parlamentoyê û Mihemed Tewfîq Rehim (YNK) ji bo cigirê serok ya Parlamentoyê Neteweyî ya Kurdistanê hatine hilbijartinê. Serokê parlamentoyê Cewher Namiq Salim bi axaftineke spasî endamên parlamentoyê kir û

berpirsiyarî û vatiniyên li pêş xebata parlamentoyê anî zîman.


Saet 13.10 serokê parlamentoyê dawî li xebata civîna yekem ya parlamentoyê anî û diyar kir ku di roja 06.06.1992-an de saet 10.00 parlamentoyê ji bo berdevamiya xebata xwe dicive.

Di roja 06.06.1992-an de ji parlamentoyê ji bo berpirsiyariya sekretariyê Firset Ehmed Ebdullah (PDK-I) hilbijart. Navên parlamenteran di vê hejmarê Berbangê de tê çapkirin.




Serokê Parlamentoyê Cewher Namiq Salim li gel cigirê wî Mihemed Tewfîq Rehim piştî hatin hilbijartin.


Foto: Berbang



Sadî Ahmed



Şîrayî Aziz



Ebrîm Asgêr

Navê Endamên Parlamentoya Kurdistan

Endamên Parlamentoyê ji

Lîsteya Yekîtiya Niştimanî Kurdistan û Partî Zehmetkêşanî Kurdistan

Nav	Sali ji dayikbûn	dereca xwendinê
1- Ebubekir Heci Sefer Xulam	1944	nawndî
2- Ehmed Ebubekir Hesên Bamernî	1951	doktora
